# welat

Sal:2 Hejmar: 80 29 Tebax-4 Mijdar 1993 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

Gilgilfiroşên Kurd:

## 'Ne ji zabite û polîsan be karê me baş e'




Rûpel 6

*Dewlet êdî nikare qereqolên xwe yên biçûk biparêze, hêzên xwe vedikişîne nav qerargehên mezin. Li ser vê yekê ;*

# Gerîla berê xwe dide tabûran

Rûpel 8




*Di sala 93'yan de ji sedî zêdetir qereqolên dewletê bûne hedefên cerdên gerîlayên ARGK'ê û di van êrîşan de derbeyên pirr xedar xwarine. Di wêneyê jor de rewşa qereqola Derecikê ya ku gerîla cerdî ser kiribû, tê dîtin.*



## MITIRB KANIYA HUNERÊ NE

Mitriban ne tenê xweşikbûnê îdealîze dikirin, lê di hinek cihan de şer jî dihat îdealîzekirin. Li gora vê îdealîzekirinê û standartkirinê, şerên di navbêna eşîrê Kurdan de, şerekî bênavber e. Tu hêz, herdu aliyên ku şer dikin, ji hevdu cihê nakin. Kuştin û xwînrijandin bêsînor e. Di pirr şeran de, jin û zarok jî tên kuştin.

Rûpel 11



## 'MIROV DIVÊ LI SER ZEMÎNEKE QEWÎN XEBATA HUNERÎ BIKE'

Îro êdî derev li ser avê ketiye. Her çiqas dewleta Tirk bi zilm û zorê tiştên me ji xwe re kiribe mal jî, her tişt eşkere bûye. Em hîn nû bi hişê xwe ve tên. Lewre divê em ji qurmê xwe ve li xwe binêrin û tiştine bidine milet.

Rûpel 13

# Nûçeyên Cengê

**20 Tebax 1993:** Zordestî û pesta dewletê ya li ser gundan bi awayekî peryodîk didome. Hêzên dewletê bi hevkariya cerdevanên gundê Xirabêripîn, bi topên hewanê û roketavêjan avêtin ser gundê Hespist ku li ser navçeya Hezex (Îdîl) ya Şirnexê ye; 4 kes birîndar bûn û gelek xanî şewitîn. Bi zordestiya cerdevan û hêzên dewletê gundên Şewsê, Bizênka û Mehîna jî bi vî awayî vala bûn. Ji gundê Baqirdê yê Misircê jî 20 mal koç kirin.

Cerdevanên gundên Zoqbirîn û Şkeftan ku li ser navçeya Hezro ya Amedê ne avêtin ser gundên Zengê, Kerwas û Mişêv ku li ser Licê ne, gundiyan li meydanên gund civandin û li wan dan. Di vê navê de li wê herêmê di nav gerîla û hêzên dewletê de şer derket 2 cerdevan û 3 leşker hatin kuştin.

Gerîlayên ARGK'ê riya ser Henê girtin û nasnameyan kontrol kirin. Di kontrola nasnameyan de gerîla xwest ku êdî divê gelê Kurd nasnameyên Komara Tirkiye hilnegire. Pêvajo êdî vê divê. 3 gerîla li hêla gundên Kanîspiyê û Kelebînê ku li ser Qosera Mêrdînê ne ji ber ku berikên wan qediyan xwe îmha kirin.

32 cerdevanên gundê Argo ku li ser Hewêla (Bayqan) Sêrtê ne îstîfa kirin. Li Sasonê ji gundên Şêxan 3 cerdevan çekên xwe teslîmî qereqola cendirmeyan kirin.

**21 Tebax 1993:** Piştî navçeyên Gever û Çelê dewletê ev car Cizîrê da ber gulleyan.

Di vê êrîşa ku 4 seat û nîv domiya de, li seriya 20 malan bi rokeavêjan xesirîn û nêzîkî 600 dikanî bi vî awayî zirar standin.

Li Ruhayê 4 erebeyên şantiya Sûrûcê ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hatin şewitandin. Piştî gerîla xwe ji gundê Şehîs (Yoğurtav) da alî, hêzên dewletê avêtin ser gund û tahde li gundiyan kirin.

**22 Tebax 1993:** Gerîlayên ARGK'ê cerdî ser qereqola "Sultantopu" ya li sînor ku li Îdirê ye kirin, 16 leşker hatin kuştin, 2 leşker jî dema ji bo herin cihê bûyerê erebeya wan li mayînan qelibî û bi vî awayî mirin.

Wekî din li Amedê li ser riya Farqînê, gerîla avêtin ser qumandariya Alayê ya cendirmeyan. Nêzîkî 3 seatan şer dom kir û 12 leşker hatin kuştin.

Li Misircê di şerê nav gerîla û hêzên dewletê de 2 gerîla hatin kuştin. Gerîla ji gundên Tendurekû Kiznefer ku li ser Îdirê ne 2 xayîn kuştin, 2 dibistan şewitandin. Di şerê gerîla û hêzên dewletê de, li gundê Hedal ku li ser Pîrana (Dîcle) Amedê ye 8 leşker hatin kuştin. Piştî şer hêzên dewletê gundê Dehol bombebaran kirin.

**23 Tebax 1993:** Gerîlayên ARGK'ê li hêla Melkîşa ku li ser Hezo ya Batmanê ye li dora 100 erebeyan dan sekinandin û nasnameyan kontrol kirin. Li ser vî awayî dewletê li wê herêmê operasyonekê pêk anîn. Li gor nûçeyên herêmî tê gotin ku hejmara birîndar û kuştiyan zêde ye, lewre nexweşxaneya Batmanê ji kesên sivîl re hatiye girtin. Operasyon bi pirranî li hêlên Baştirmajorîn û jêrîn, Kaniyahenê, Dêrayê, Baksarê, Baştirmê û Kahveci xurt bûye. Gerîla ji Qilabana Şirnexê 4 cerdevan ji eşîra Kaşûran revandin.

**24 Tebax 1993:** 18 gerîla di şerê li hêla Melkîşa de hatin kuştin. Di 22 Tebaxê de gerîlayên ARGK'ê 4 tûrîst û 2 rêberên wan bi xwe re biribûn, li ser vî awayî hêzên dewletê, li herêmê operasyoneke berfireh pêk anîn û di vî şerê li deverên dor Hezoya Batmanê de 18 ji gerîla û gelek leşker hatin kuştin. Gundên nêzîkî Baştirma jorîn û jêrîn hatin şewitandin.

Gerîla avêt ser qereqola gundê "Sütlüce" ku li ser navçeya Adaklı ya Çekepçûrê (Bîngol) ye, leşkerek mir dido birîndar bûn. Di vê navê de gerîla bi roketavêjê êrîşî wergeha hikûmetê kir û ew xesirand.

Li Erzeromê jî gerîla li navçeya Xinisê 3 qemyon û 2 qirêderên DSÎ (Avahiya Karên Dewletê yên Avê) şewitandin. Panzerek di ser mayîna ku gerîla li Şirnexê raxistibû de, derbas bû û îmha bû.

Di cerdên gerîla yên ku li Sêrtê û Çepekçûrê (Bîngclê) li gundên cerdevanan pêk hat, 2 cerdevan hatin kuştin. Li riya di navbera Meletê û Elezîzê de gerîla tankêra mazotê ya "Elaziğ Köy Hizmetleri" şewitandin.

**25 Tebax 1993:** Bi cerda hêzên dewletê ku li Zivingê gundê Nisêbînê pêk hat, 4 gerîla hatin kuştin. Ji gerîlayên ku hatin kuştin 2 kes bi navên Bedirxan û Übeyit Çiçek tesbît bû ku ji "Yardere" ne.

Gerîla sê qemyon û du dozerên şantiya Kercewsê şewitandin. Li Cûlemêrgê gerîla û cerdevanên êla Jirkî li hev xistin, 7 cerdevan hatin kuştin. Piştî vî şerî hêzên leşkerî herêmê bombebaran kirin. Tê diyarkirin ku zêdeyî 500 heywan telef bûne.

Li Mûşê ji gundê Eralan kesek bi navê Mehmet Cansiz bi mebesta xayîntiyê ji aliyê gerîla ve hate kuştin.

**26 Tebax 1993:** Kerborana Mêrdînê ji aliyê hêzên dewletê ve bi topên hewanê hate kutan. Bi vê êrîşê leşkeran 15 dikan şewitandin. Gel bi dest bi koçê kir. Li Dêrsimê jî leşkeran daristana li hêla Xozadê şewitandin.

Le Kercewsa Batmanê gerîlayan 3 lezimên cerdevanan revandin, li ser vî awayî cerdevanên gundê Batê ku li ser Midyadê ye jî, ji Kefrê 4 kes revandin. Cerdevan dibêjin heke lêzimên me neyên berdan emê van 4 kesan bikujin.

Li Cûlemêrgê li navçeya Çelê gerîla û cerdevan li hev xistin; gundiyek û gerîlayek hatin kuştin, 6 cerdevan birîndar bûn.

Li Şirnexê jî li navçeya Beytûşebabê 9 cerdevan îstîfa kirin. Hêzên dewletê li BaştirmaJorîn ku li ser Hezoya Batmanê ye, gulle li gel reşandin. Gelê vî gundî û yên gundên der û dor li hev civiyabûn ku herin cenezayên gerîlayan bînin bin ax bikin, bi vî awayî leşkeran li girseya gel gulle reşandin.

# Festîvala Batmanê hate îptalkirin

**Navenda Nûçeyan**–Festivala ku ji aliyê Sendîkaya Petrol-İş'ê û di Parêziya Mafên Mirovan de Însiyatîva Hunermendan ve li Batmanê hatibû organîzekirin û dê zêdeyî 100 hunermendî beşdar bibûna, ji aliyê Emniyeta Batmanê ve hate îptalkirin. Ev organîzasyon cara duyemîn e ku, ji aliyê dewletê ve tê qedexekirin.

Rayedarên Emniyeta Batmanê, ji Serokê Petrol-İş'a Batmanê Ahmet Tîmûrtaş re, sedemê qedexekirina Festîwala Hunerî û Çandî ya Batmanê wiha gotin: "Em dizanin ku meha Tebaxê, meha livbaziyên PKK'ê ne. Petrol-İş û hunermendên ku dê bihatana jî bi vê yekê dizanin. Û em dizanin festivalên ku di van mehan de têne organîzekirin ji kê re xizmetê dikin.Lewre jî em nayên lîstikên wiha û destûr nadin festivalê".

Rayedarên Emniyeta Batmanê daxuyandin ku, dê li herêmê bi tu awayî rê nedin festivalên bi vî rengî. Hunermendên ku, werin jî, dê werine girtinê.

Li ser qedexekirina festîvalê, di Parêziya Mafên Mirovan de Însiyatîva Hunermendan beyanek weşand. Beyana hunermendan bi kurtî wiha ye: "Emniyeta Batmanê di serdana me ya pêşî de, soz da ku, piştî 20'ê Tebaxê di kîjan mêjûyê de werin, dê destûra festivalê bidin. Lê li ser sozê xwe nesekinîn. Ramana bingehîn ya vê festîwalê bi gelê Batmanê re, parvekirina daxwaza me ya biratî ya aştiyê bû. Lê yên ku li hember aştî û biratiyê ne, destûr nedan vê festivalê. Bila bê zanîn ku, em li hember vê yekê bêdeng namînin".

Ger festival pêk bihata dê bi dehan nivîskar, rojnamevan, hunermend, komele û sendîkavan beşdar bibûna. Lê, weke ku diyar dibe, dê hê demeke dirêj daxwazên aştiyê bi xwînê bêne fetisandin.

# HAWAR

**Dilbixwîn**

## Kampanya

Gerîla jiyana gel e. Çawa ku ji bo mirovekî jiyan pêwist e, wisa ji bo gelekî hebûna gerîla pêwist e. Gel bi çeka di destê gerîla de xwe diparêze. Em bi kurtî nav lê dikin gerîla, lê gelek wateyên vî navî hene: Kesê ku ji her kesî bêhtir zor û zehmetiyê dibîne. Berî her kesî sînga xwe dide ber berikan û piştê nade ber. Mirovekî wisa ye ku, ji tirsê re dibêje "na" Xwediyê cerasereteke mezin, cegerdar, dilêr û gernas e.

Navekî leşkerî ye, şoreşgerî ye, lê dîrok, lîteratur, çand û şexsiyeta neteweyeyî diparêze. Lewre gerîla ji azadiyê re jiyan e. Dema ku navê gerîla tê ziman, tavilê çarenûsa 35-40 milyon Kurd tê pêşiya çavên mirov. Em nav li şoreşgerên xwe nakin "mehmetçîk", em nav li wan dikin gerîla! Di tengasiyan de hewara azadiyê ye, ew rûmeta jiyanê ye.

Her neteweyek xwe bi artêşa xwe serbilind dibîne. Ên me jî, çiqas kêmasî hebin jî, gerîlayên me serbilindî û şahnaziya me ne. Ez matmayî dimînim; dema ku gerîlayên Kurdan tune bûn wan çawa xwe diparastin?! Hûnê bersivê bidin û bibêjin, Kurdan delîve (firset) nedîtine ku, xwe biparêzin û li ser riyên parastinê bifikirin, ji ber ku tunebûna gerîlayên Kurdan rê li pêşiya dijmin vekiriye ku, nehêle bifikirin jî. Hemû tişt qedexe kiriye. Hêzeke wisa xurt tune bûye ku rê li pêşiya dijmin bigire û nirxên neteweyî biparêze.

***Serok Abdullah Öcalan di axaftineke xwe de wiha dibêje: "Neteweya bêgerîla, neteweyeke bêxwedî ye. Her kes dikare wê neteweyê ji xwe re bi kar bîne, nikare xwe ji qirkirinan biparêze. Berê digotin Kurd gelekî bêabûqat e. Di dadgehan de kesek piştgiriya wî nake. Belê, rast bû. Niha rewş bi awayekî din e. Abûqatên me gerîlayên me ne. Ên di dinyayê de Kurd vejandin û weke mirov nîşan dan dîsa gerîla ne. Ji ber vê yekê ez nikarim rojekê tenê jî bi gerîla re jiyan nebim. Bi gerîla re jiyan diafire.***

Dema ku gerîlayên Kurdan tune bûn, di dinyayê de Kurd tune bûn. Hemû hebûnên wan hatibûn talankirin, her tişt ji dest hatibû girtin, kesek tune bû xwedî lê derkeve û li mafên wan ên rewa (meşrû) bipirse. Hêdî hêdî ronahiya Kurdan melûl dibûn. Ber bi windabûnê ve diçûn, hema hema winda bûbûn. Tu giraniya wan di mêzîna cîhanê de nemabû. Niha rewşa Kurdan cudatir e, gerîla heye.

Li ser pêwistiya hebûna gerîla, di tevgera rizgariya neteweyî Kurdistan de, Serok Abdullah Öcalan di axaftineke xwe de wiha dibêje: "Neteweya bêgerîla, neteweyeke bêxwedî ye. Her kes dikare wê neteweyê ji xwe re bi kar bîne, nikare xwe ji qirkirinan biparêze. Berê digotin Kurd gelekî bêabûqat e. Di dadgehan de kesek piştgiriya wî nake. Belê, rast bû. Niha rewş bi awayekî din e. Abûqatên me gerîlayên me ne. Ên di dinyayê de Kurd vejandin û weke mirov nîşan dan dîsa gerîla ne. Ji ber vê yekê ez nikarim rojekê tenê jî bi gerîla re jiyan nebim. Bi gerîla re jiyan diafire.

Ne tenê ji bo Kurdan, gerîlayên me serbazên mirovahiyê ne jî. Nirxên mirovahiyê diparêzin. Çawa? Dijmin bi hemû hewldanên xwe li Kurdistanê mirovahiyê diperçiqîne. Gerîlayên me rê li pêşiya meşa dijminê mirovahiyê digirin. Ji lew re em dibêjin gerîla serbazê (leşkerekî) mirovahiyê ye..."

Êdî divê zincîrên ku heya niha Kurd pê hatibûne girêdan werin qetandin. Ji koletiyê re bes e! Artêşa me hatiye avakirin, di 94'an de hejmara gerîla xwe digihîne 30 hezar şervan. Xwedîderketina li 30 hezar gerîla, gaveke pirr bi nirx e, gaveke pîroz e.

Her kes artêşa xwe mezin dike. Dijmin jî, hemû hatina xwe ya aborî li çûyînên artêşê mesref dike. Em bi hemû derfetên xwe yên madî û manewî di seferberiya neteweyî de cih bigirin. Bila kesek nebêje ez nikarim, îmkan tune ne. Di seferberiyê de her tişt li ser piyan disekine, di herdu kefên mêzînê de li aliyekî man û li aliyê din jî neman e.

Werin Kurdên Kurdistana azadiyê!

Em meşa kampanyaya azadî û avakirina Kurdistanê bi rihê seferberiya neteweyî xurt û mezin bikin.




*Di wêne de, serokê Sandinîstan Danîel Ortega (li aliyê rastê) ji bo serbest berdana kesên dîl ji Partiya Muhafazakar, bi berdevkê 'Komando31' (aligirên Sandinîstan) re di guftûgoyê de tê dîtin.*

# Li Nîkaraguayê tevlîhevkirina kontrayan

**Nuçeyên Derve**–Piştî ku roja şemiyê kontrayan hinek kes ji heyeta hikûmetê, ji bo îstifakirina serokê artêşê û şêwirmendê serokkomar revandin û dîl girtin. Vê carê Sandinîstan ji bo xelaskirina van kesan avêtin ser civîna YDN'ê (Yekîtiya Dijberiya Neteweyî) û cîgirê serokkomar jî di nav de hinek polîtîkavanên muhafazakar (kevinparêz) dîl girtin.

Bi van bûyeran, li Nîkaraguayê serêşiyên mezin çêbûn. Lê piştî hinek guftûgoyan, Serokê kontrayan Jose Angel (Jackel) 20 kes serbest berdan, Sandinîstan jî 19 kes serbest berdan. Li ser vê yekê piçekî atmosfera lihevkirinê çêbû û roja 26' Tebaxê jî bi serbest berdana hemû kesên dîl ev pirsgirêk çereser bû.

Wisa xuya ye, pirsgirêkên wan her tim zêde dibin û ji çareserkirinê dûr in. Ji ber ku, nakokiyên di nava van herdu hêzan de, berberiyên çînî ne. Hikûmeta Çamaro, bi hinek soz û peymanan hate ser kar, lê ne dikare daxwazên gel û Sandinîstan bîne cih, ne jî yên kontrayan (ji ber ku, hêzên leşkerî û ewlekarî di bin kontrola Sandinîstan de ne).

Gel naxwaze tiştên piştî şoreşê bi dest xistine winda bike. Lê Amerîka dixwaze tiştên li destê şoreşvanan çêbûyî betal bike, wek erdên di gel belavkirî, veguherînên çandinî û hwd.

# Li Perûyê şerê qirêjî berdewam e

**Nuçeyên Derve**–Li Perûyê ji aliyê hêzên tarî ve her roj gelek kes têne revandin û kuştin. Li Zanîngeha Lîma, heta niha zêdetirî 7 kesî bi vî awayî winda bûne. Cendekê du xwendekarên ku meha Tîrmehê hatibûn revandin, cihê gora wan kifş bû. Nifteya ku, ji gorê derket li deriyê xwendekaran hat. Li gor kesên ku ji bo mafê mirovan dixebitin, ev kuştin bi destê hêzên dewletê çêdibin.

Li aliyê din, hefteya borî, roja 23'yên Tebaxê hêzên ewlekariyê dan xuyan ku, piştî şopandineke dirêj, mirovekî ji Komîteya Navendî ya Riya Ronahî girtine. Navê wî Coks (Cox) Beuzeville ye. Dîsa hêzên dewletê gotin ku, ewkes ji bo pirsiyariyê şandine Navenda Beşa Antî-terorê û zêdetir jî agahî nedan. Lê hinek çavkaniyan wiha gotin: "Coks di mala xwe de hatiye girtin, cînarên wî, ew wek mirovekî baş û zimanxweş nîşan dane." Li gorî wan çavkaniyan, Coks berê jî, 6 salan ji bo sûcê terorê di girtîgehê de maye. Ji meha Îlonê ya 1992'yan vir ve ev bûn 3 kesên ji pileya bilind ku, bi dest dewletê dikevin. Cara yekemîn, di meha Îlonê de Serokê R.R'yê (Riya Ronahî) Guzman û hinek kesên girîng, di meha Cotmehê de jî Marta Huatay (ew jî pêşeng bû ji bo wê rêxistinê) hate girtin.

Carlos Tapîa, pisporê R.R'yê li ser vê babetê wiha got: "Her çiqas vê rêxistinê hinek derbe xwaribin jî, şerê gerîla li Perûyê naqede. Ji ber ku nîjadperestî, xizanî û hinek nexweşiyên aborî didomin. Ji lew re dê mirovên ku çekan hilgirin û têkevin nav refên gerîlayan her hebin."

# 'Azeriyan Cebraîl bi şûn ve girtin'

**Nuçeyên Derve**–Li gor daxuyaniyeke Wezareta Parêziyê ya Azeriyan, ku roja yekşemê hate weşandin, Azeriyan navçeya Cebraîl bi şûn ve girt. Lê hin girên stratejîk di bin kontrola Ermeniyan de ne. Di eynî daxuyaniyê de tê gotin ku, Ermeniyan gundê Ezburn nêzîkê sînorê Îran bi dest xistine. Agahiya tu kuştinan neketiye destên me.

Azerî bidestxistina Cebraîl wek serkeftinekê nîşan didin, lê rojnamegerên herêmî dibêjin ku, navçe di berê de di bin kontrola Azeriyan de bûye û hemû girên stratejîk di bin kontrola Ermeniyan de bûye. Jixwe, ajansên nealîgir jî dagikirina navçeyê ji aliyê Ermeniyan ve teyîd nekirin. Fermandarekî Ermeniyan ê herêmî wiha got. "Ermeniyan tu caran hewldana dagirkirina navçeyê nekirine, ji ber ku, navçe nêzîkî sînorê Îranê ye."

Fermandarê hêzên leşkerî yên Nogorno Qarabaxê: "Heke me ev navçe dagir kiribe, me xeletiyeke mezin kiriye. Ji ber ku ev tişt dê sergêjiyên mezin bi xwe re bîne." Em naxwazin tu gengeşî di navbera Îran û Nogorno Qarabaxê de derkevin."

Desthelatdarên Azeriyan dibêjin ku, Ermeniyan di nava mehekê de li herêma Cebraîl û Fûzûlî 48 cih û warên Azeriyan dagir kirine û Fûzûlî dorpêç kirine.

## JI ÇAPEMANIYA BIYANÎ

**The Guardian** INTERNATIONAL

# Demên hovîtiyê

"Du hefte berê, nûçevan Aysel Malkaç (22) ji navenda rojnameyê derket û careke din hevalên wê ew nedîtin. Texmîn dikin ku hatiye kuştin.

Ev texmîn bêsebeb nîn e, ji ber ku, ji meha Gulanê (meha derçûna rojnameyê) vir ve zêdetirî 8 rojnameger û belavkerên Özgür Gündem'ê bi awayekî nepenî hatine kuştin.

Hafiz Akdemîr, kesê yekemîn bû ku, piştî gelek tehdîtan hate kuştin. Cendekê wî di bin çavdêriya polîsan de hate veşartin û lêzimên wî gotin ku, dema cendekê Hafiz ji morgê derxistin, ji polîsan lêdan xwarine. Rojnamagerên din jî bi destên "hêzên tarî", bi rengên cur be cur hatin kuştin.

Nivîskarekê vê rojnameyê, bi navê xwe Gülten Kişanak (32) dibêje: "Ez hewl didim ku, bi şev tenê serê xwe dernekevim derve." Nûnerên rojnameyê yên li herêma Kurdan, bi şev jî, li ofîsê dimînin, deriyê xwe pihêt radinin. Lê piştî windabûna Aysel Malkaç, rojnamegerên li Stenbolê bergiriyên (tedbîr) nû digirin.

200 kes li Özgür Gündem'ê dixebitin, zehfên wan Kurd in. Peywira xwe wek li pey rastiyan bin, nîşan didin. Bi herêma Kurdan re herêma herî xizan û dera ku, şerê PKK'ê li hemberî dewletê diqewime têkiliyan rojnameyê xurt in. Tê gotin ku, Serokê PKK'ê bi navekî din di qunciкê rojnameyê de dinivîse.

Dema serokwezîra Tirkiyeyê, rojnameyan ji bo piştgiriyê li ser pirsgirêka Kurdan vexwendin civînê, Gündem venexwend. Rexnegirên rojnameyê dibêjin ku, ew rojname piştgirê PKK'ê ye û dîtinên wê tîne ziman. Kesên ku, li ser navê rojnamegeriyê hatine kuştin jî, dibe ku endamê PKK'ê bin.

Berdevkê Hikûmetê Yildirim Aktuna, di civînekê de got ku, "Dibe ku hinek terorîst ketibin nav rojnameyê, divê vekolîn li ser vê yekê çêbibe."

Heta niha 80 hejmarên rojnameyê hatine berhevkirin, carekê polîsan biryara berhevkirinê hîn ku, rojname çap nebûbû anîn. Di meha Çileyê de, ji ber van hoyên tund (kuştin, berhevkirin, pêkutî) bo demekê biryara radanê girt.

Serê vê mehê cendekê nûçevanê Bilîsê, li Goristana Mazrayê (Elezîz) hate dîtin. Ferhat Tepe demek berê ji aliyê hinek kesan ve hatibû revandin. Yekî li ser navê "Yekîneya Tolhildana Tirkên Osmanî" telefonî bavê Ferhat kir, hinek tehdît û daxwaz pêşkêş kir. Bavê Ferhat dengê wî şiband dengê fermandarekî Tugayê (Korkmaz Tağma). Li ser cendekê Ferhat şopên lêdanê hatin tesbîtkirin.

Ji hejmara The Guardianê ya 23 yê Tebaxa1993'yan

# Hewldana Îtalyayê ji bo berdana tûrîstan

**Nûçeyen Derve**–Rayedarên Konsolosxaneya Enqereyê yên Îtalya ji bo ku tûrîst serbest bêne berdan, roja 21'ê Tebaxê serî li Wezîriya Karê Derveyî ya Tirkiyeyê dan.

Gerîlayên ARGK'ê bi "hinceta ku bêdestûr tûrîst hatine Kurdistanê" du tûrîstên Îtalyanî û duduyên Swîsreyî girtibûn. Dîsa ji bo du tûrîstên Almanî jî tê hêvîkirin ku, ji bo berdana wan serî li sazgeheke mafên mirovî ya neteweyî bê lêxistin.

Rayedarên Îtalyanî yên konsolosxaneya Enqereyê, serî li Wezîriya Karên Derveyî ya Tirkiyeyê dan ku tûrîstên roja 20'ê mehê ji aliyê ARGK'ê ve hatine revandin, bêne berdan.

Navê tûrîstên Swîsreyî û Îtalyanî ev in: Anna Dandreo, Angelo Palego, Nîco Rîcarda, Giuseppe Virgilîo.

Ji hêla din ve heyeteke pispor a Alman li ser revandina herdu tûrîstên Alman, hatiye Tirkiyeyê. Lê hate hînbûn ku, ev heyet ta niha ji bo serbest–berdana herdu tûrîstên Alman tu hewlekê pêk neaniye. Li ser daxuyana ARGK'ê ya der barê tûrîstên revandî de ku, hewldana dewletan dixwaze ji bo berdana tûrîstan, endîşeyekê di nav dorhêlên dîplomatîk de bi xwe re afirand.

Swîsreyê jî, ji bo berdana hemwelatiyên xwe tu hewldaneke fermî pêk neanî. Bes Berdevkê Wezîriya Karên Derveyî yê Swîsreyê Franz Egle, li ser tûrîstên revandî ku bi hinceta bêdestûr hatine Kurdistanê ARGK'ê ew revandine jî wiha peyivî: "Em raste rast bi PKK'ê re nakevin têkiliyan. Ji ewlekariya Tirkiyeyê, rayedarên wê berpirsiyar in."

# Li dij pestên ser Gündem'ê greva birçîbûnê

Xebatkar û rêveberên rojnameya Özgür Gündem'ê, ji bo protestokirina pêkutiyên li ser rojnameyê û berdana nûçevan Aysel Malkaç dest bi greva birçîbûnê kirin. Greva birçîbûnê ya xebatkar û rêveberên Özgür Gündem'ê, bi dorvegerî û bêdawî ye. Grev roja 23'ê Tebaxê, li Komeleya Mafên Mirovan Şaxê Stenbolê, bi beşdariya Cîgirê Berpirsiyarê Giştî yê Gündem'ê Ferda Çetîn, Gerînendeyê (midûr) Saziyê Yûcel Halîs, nûçevanên rojnameyê Atila Halîs, Bülent Çiftçî û Mihrîban Artiklar dest pê kir.

Gelek komele, kovar û saziyên demokratîk jî destek didin vê grevê. Xebatkarên KMM'ê Şaxê Stenbolê, nûnerên rêxistinên DEP'ê yên li Stenbolê, xwediyê kovara Devrîmcî Proleterya Mustafa Büyükdağ û nûnerên kovar, komele û saziyên din qewlên piştgiriyê dan û Mustafa Büyükdağ jî, bi rêveber û nûçevanên Gündem'ê re ket greva birçîbûnê. Dê beşdarên greva birçîbûnê ji 2 rojan carêkê biguherin û dê grev ta ku encamek bi dest bê xistin bidome.

Berpirsiyarê Giştî yê Özgür Gündem'ê Gurbetellî Ersöz, li ser biryara greva birçîbûnê rawestiya, qala pêkutiyên li ser Özgür Gündemê kir û ev agahdarî dan:




*Xebatkarên rojnameyê bi piştgirên vê livbaziyê re di greva birçîbûnê de têne dîtin*

"Midûrên Emniyetan, bi biryarên xwe yên şexsî dikarin rojnameya me bidin berhevkirin û belavkirina wê qedeqxe bikin. Her roj cerdî ser buroyên me dikin, xebatkarên me binçav dikin û avahiyên me talan dikin.

Nûçevanên me têne revandin, girtin û qetilkirin. Berpirsiyarê me yê Nivîsaran Ş.Davut Karadağ li Girtîgeha Sağmalcilar'ê, Nûnerê me yê Samsûnê Mehmet Yazici li Erzeromê, nûçevana me ya Mêrdînê Nezahat Özen li Ruhayê, nûçevanê me yê Bazîdê Ahmet Îçge li Agiriyê girtî ne. Nûnerê me yê Cizîrê Salih Tekîn, ji aliyê Emiyeta Şirnexê ve di binçaviyê de tê girtin, Nûçevanê me yê Bilîsê Ferhat Tepe, piştî ku ji aliyê polîsên sivîl ve hate revandin, li Mazra (ELezîz)yê hate qetilkirin, nûçevana me ya Stenbolê Aysel Malkaç, 17 roj berê, dîsa ji aliyê polîsên sivîl ve hate revandin û heta niha, rayedarên dewletê li ser binçavkirina wê tu beyan nedane." Gurbetellî Ersöz, daxuyand ku ev pêkutî, di şexsê Özgür Gündem'ê de, li hemû çapemeniya azad tê kirin û divê, hemû bi hev re li hember vê terora dewletê derkevin, têbikoşin. Gurbetellî Ersöz, bang li hemû rêxistinên girseyî, hunermend, nivîskar û rojnamevanan kir da ku piştgirî bidin Özgür Gündem'ê.

Ji aliyê din ve, biryara greva birçîbûnê di nava qada navneteweyîde jî deng da û heyetên biyanî dest bi serdanan kirin. Heyeteke Alman ku ji bo lêkolîna pest û pêkutiyên li ser Kurdan hatibûn Stenbolê, Rojnameya Özgür Gündem'ê ziyaret kirin û piştgiriya xwe ji bo greva birçîbûnê û armancên grevê diyar kirin.

Wekî din koma zarokan a mûzîkê ya Navenda Çanda Mezopotamyayê, Gulên Mezrabotan jî, beşdarên grevê ziyaret kirin û piştgiriya xwe diyar kirin. Dê ji Rojnameya Welat jî îro (yekşemê) heval Mazhar Günbat beşdarî greva birçîbûnê bibe.

# DGM'ê biryara girtina Yaşar Kaya da

**Navenda Nûçeyan**–Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê, di mehkemeya Özgür Gündemê ya dawî de, der barê Xwediyê rojnameya Özgür Gündem'ê Yaşar Kaya û Berpirsiyarê Nivîsaran yê kevin Şeyh Davut Karadağ de, ji ber ku nehatine dadgehê û îfade nedane, di giyabê wan de biryara girtina wan da. Weke tê zanîn, Şeyh Davut Karadağ ji ber nivîsên di Gündem'ê de hatine weşandin niha hepiskirî ye. DED (Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê–DGM) Berpirsiyarê Nivîsaran yê Özgür Gündem'ê Kamîl Çelikten ku, cara yekemîn derdiket dadgehê jî, ji ber hevpeyvîna Mehmet Oğuz ya bi Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan re kiriye girt. Lê dû re ew serbest berda.

Roja 25'ê Tebaxê, li ser nivîsên di Özgür Gündemê de, di 2'yê Hezîranê de hatibûn weşandin, li DED'ê ya Stanbolê mehkeme civiya. Berpirsiyarê wê demê Şeyh Davut Karadağ –ku niha di zîndanê de ye– û Yaşar Kaya nehatibûn mehkemeyê. Ji Ebûqatên rojnameyê Arzu Şahîn di mehkemeyê de daxuyand ku, Yaşar Kaya rojek berê bi Serokkomar Süleyman Demîrel re hevdîtinek pêk aniye û roja mehkemeyê jî li Enqerê bi Serokê Meclîsa Tirk re di hevdîtinê de bûye. Lê dê roja 30'yê mehê bikaribe beşdarî mehkemeyê bibe.

Piştî parêziya ebûqat, dozgerê dûyemîn yê DED'ê, daxwaza girtina Yaşar Kaya û Şeyh Davut Karadağ kir. Li ser daxwaza dozger, Serokê Dadgehê Uğur Çorumluoğlu, ji ber ku Kaya û Karadağ nehatine mehkemeyê, biryara girtina herduyan da. Li aliyê din, dadger biryar stand ku, Yaşar Kaya û Şeyh Davut Karadağ, piştî anîna wan a mehkemeya di 14'ê Cotmehê de bêne azadkirin.

Berpirsiyarê Nivîsaran ê Özgür Gündem'ê yê niha Kamîl Çelikten, ji ber hevpeyvîna Mehmet Oğuz ya bi Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan re, ku di 23–24–25'ê Tebaxê de hatibûne weşandin ji aliyê eynî mehkemeyê ve hate girtin. Kamîl Çelikten dû re dîsa ji aliyê mehkemê ve hate azadkirin.

# Tirkiyê Konsolosê Bernê vekişand

Problemên di navbera Tirkiye û Swîsreyê de –ku, di meha Hezîranê de di xwepêşandana Kurdan de, ji konsolosiya Tirk gulle berdabûn, ser Kurdan û xortek bi navê Şemsettîn Kurt hatibû kuştin û hikûmeta Swîsreyê, ji bo mehkemekirina qatilan daxwaz ji Tirkiyê kiribû her diçe dijwârtir dibe.

Hikûmeta Swîsreyê, piştî bûyerê xwestibû 2 parêzgerên konsolosxaneyê bide mehkemeyê, lê hikûmeta Tirk herdu parêzgeran vekişandibû û rê li ber daxwaza Swîsreyê girtibû. Dû re, herdu hikûmet bi notadayînê helwesta hevûdin protesto kiribûn û têkiliyên wan hatibûn ber qutbûnê.

Tirkiye, ji bo bikaribe konsolosê xwe yê Swîsreyê –ku emrê teqandinê dabû û bi xwe jî agir reşandibû ser protestovanan Kaya Toperî ji darazdiye (mehkemekirinê) biparêze, demek berê ew vekişandibû Tirkiyê. Lê Kaya Toperî, hê jî wek konsolosê Tirkiyê yê Swîsreyê dihate xuyan. Hikûmeta Swîsreyê, piştî lêkolînên xwe yên li ser fotografên dema bûyerê û bişaftina axaftinên bêtêlê, berpirsiyariya Kaya Toperî ya di kuştina Şemsettîn Kurt de îspat kir û ji bo mehkemekirina Kaya Toperî daxwaza rakirina destnedana wî ji Tirkiyê xwest. Tirkiye piştî ku dît çare nîn e û nikare Kaya Toperî ji destê Swîsreyê xelas bike û sûcdariya wî veşêre, dest avêt polîtîkayeke nû û ji bo Swîsre konsolosê xwe yê Enqerê tevî 2 alîkarên wî ji Tirkiyê derkevin, notayek da Îsviçre. Hikûmeta Swîsreyê jî, vê taktîka Tirkiye protesto kir û vê biryarê wek biryareke bêdadî nirxand.

Niha têkiliyên Tirkiye û Swîsreyê li ber qutbûnê ne. Lê wisa eşkere bûye ku, dê Tirkiye nikaribe sûcê xwe yê di kuştina Şemsettîn Kurt de veşêre û xwe ji vê berpirsiyariyê xelas bike.

# Ji serokatiya SHP'ê re sê berendam



*A. Güven Gürkan*



*Murat Karayalçın*



*Yüksel Çakmur*

**Navenda Nûçeyan**–Bi nêzîkbûna Kongreya SHP'ê ya Mezin a Adetî ve, ji bo serokatiyê hejmara berendaman jî zêde dibe. Heta niha ji SHP'ê Serokê Belediya Enqerê Murat Karayalçin, Serokê Belediya Îzmîrê Yüksel Çakmur û Aydin Güven Gürkan berendamiyên xwe îlan kirine. Weke tê zanîn Serokê Giştî yê SHP'ê yê niha Erdal Înönü, dê di kongreyê de, nebe berendam.

Li gor çavkaniyan, di nav berendaman de îhtîmala karkirina Aydin Güven Gürkan xurttir e. Lê rojnameyên bûrjûvazî destekeke mezin didin Murat Karayalçin û karkirina Karayalçin li gorî xwe ji niha ve garantî kirine. Murat Karayalçin wek endamê Serokwezîr Çiller û generalan dertketiye pêş. Di beyanên Karayalçin de jî ev yek xwe diyar dike. Karayalçin, di axaftinên xwe de li ser pirsgirêka Kurdî ji radiwes e û bi giştî programa hikûmetê diparêze.

Ji hêla hikûmetê ve karkirina Aydin Güven Gürkan wek dawîlêhatina hikûmeta koalîsyonê tê nirxandin. Ji ber vê yekê jî, rayedarên DYP'ê li hember Gürkan derdikevin. Lê Aydin Güven Gürkan ji aliyê pirraniya delegeyên kongreyê ve tê destekkirin.

Karkirina Yüksel Çakmur, wek îhtîmaleke dûr dixuye. Lê, Çakmur ji berendamên din radikaltir beyanan dide û der barê pirsgirêka Kurdî de qala reformên demokratîk dike.

# 400 şofêr ketin greva birçîbûnê

Li Deriyê Gumrika Xabûrê, 400 şofêrên qamyonan, ji ber ku leşker dest danîne ser mazota wan a ku ji Iraqê anîbûn, dest bi greva birçîbûnê kirin. Wekê tê zanîn şoferên ku di navbera Iraq û Tirkiyê de barkêşiyê dikin, di dema vegera ji Iraqê de, bi xwe re di depoyên ku bi qamyonên xwe ve danîne de, mazotê tînin û vê mazotê difroşin. Bi vî awayî jî ticaretê dikin.

Leşkerên ji tabûra Silopiyê ji demekê ve ye, dest datînin ser mazota şoferan û depoyên wan dişikênin. Ji ber vê yekê jî, nêzîkî 400 şofêrên ku, mazota wan ji aliyê leşkeran ve ji wan hatiye standin û depoyên wan hatine şikestin, dest bi greva birçûbûnê kirin. Li gor agahiyên ku tên, şofêr Pira Xabûrê jî, ji trafîkê re girtine.

### Gilgilfiroşên Kurd:

# 'Ne ji zabite û polîsan be karê me baş e'

**Salîh Günbat**

*Ez dixwazim we nas bikim?*

– Navê min Îbrahîm e, ez ji bajarê Mêrdînê ji navenda navçeya Nisêbînê me û 17 salî me.

*We çawa dest bi vî karî kir?*

– Beriya 2 mehan ez li welat bûm, wek hûn jî dizanin ku qet kar li welat nîn e. Ez jî hatim cem apê xwe û ev 2 meh e ku ez vî karî dikim.

*Karê we çawa diçe, qezenca we çawa ye?*

– Ku ne ji zabiteyên belediyê be, karê me baş e. Qezenca me jî baş e, lê zabite...

*Zabiteyên belediyê çi ji we dixwazin?*

– Ev 2 meh e ku, ez vî karî dikim. Heta niha roj nemaye ku em û zabiteyan nekevin qirika hev û dilê hev nehêlin.

*Çima, ji ber çi?*

– Zabite li gorî xwe karê xwe dikin. Naxwazin ku erebeyên seyar li nav bajêr bigerin, ew emir ji serokê xwe distînin.

Lê tiştekî ji bîr dikin ku, Kurdan li metropolê ji mecburî îşportakarîtiyê dikin. Tenê ew rê li ber me vekiriye em karin vî karî bikin... Ev jî zabite nahêlin.

*Hûn çima karekî din nakin an jî di fabrîqeyekê de naxebitin?*

– Min berê jî got ku, em karin seyarfiroşiyê bikin. Ji ber ku min dibistana navîn jî xwendiye ez hê baş bi zimanê Tirkî nizanim xeber bidim. Piştî wê jî xwedîkar naxwazin ku kar bidin me.

*We ji bo kar, ji kesî kar xwest?*

– Bi şexs ez neçûm min ji kesî kar nexwest, lê gelek hevalê me bêkar in. Bi dehan caran diçin li îş digerin–diwxazin jî kes îş nade wan. Ev jî, ji mecburî wî karî dikin.

*Hûn gilgil çawa amade dikin?*

– Misir (garis, gilgil) em ji halê distînin tînin malê. Pêşî qaşilê wan ji wan dikin, piştre em di nav sîtileke (beroş) mezin de, di nav avê de dikelînin. Dawî jî bi beroşeke din jî, ava sar li wan dikin û bi maşikê em li hev par dikin.

*Rojê hûn çend liban dikelînin?*

– Nezî 200 libî

*Tev tên firotin?*

– Hema bê tên firotin. Carina ku dimînin jî (15–20) lib em wan jî li zarokan belav dikin. Jixwe êvara zarok jî li benda min dimînin, ji bo ku ez gilgil bidim wan....

*Bi têne rojê çend heban tu difiroşî?*

– 70–80 hebî

*Heba wî bi çiqasî ye?*

– Bi pênc hezarî.

*Erebe yên we ne?*

– Na yên apê min in

*Yanê hûn bi yewmiyê dixebitin?*

– Belê, rojê em bi 40 hezarî dixebitin.

*Hûn çi wextî ji mal dertên, heta çi kengê dixebitin?*

– Bi roj saet li dora 10–11 an, êvarê jî saet li 11–12 'an.

*Ê 40 hezar ne hindik e, têrî xwarin, vexwarin, razan, paqijî û hwd. dike?*

– Keko xwarin, vexwarin, razan û paqijî tev jî kîsê xwediyê erebeyê ye. Tenê 40 hezar jî me re dimîne. Lê ew jî ne tiştek e.

*Ên ku erebeyên garis ne yê wan in tev bi 40 hezarî dixebitin an tu bitenê?*

– Na...Na yên li ser erebeyan tev wilo dixebitin.

*Naubera we û polîsan çawa ye, qet bela xwe li we dixin?*

– Vê gavê zabite rojê carek an du caran tên, lê polîs belkî rojê 20 carî tên û me tehdît dikin.

*Tehdîtên çawa?*

– Yaho dibêjin li vê taxê (Taxa Sultanahmet) ez careke din we nebînim "ji ber ku taxake turistik e." didin dijmînan û dibêjin emê erebeyên we bişkênin. Heta ji destê me tê em xwe digirin, lê carina zaf bi ser me ve tên. Em jî her tiştî didin ber çavê xwe û li ber wan radibin. Ew roj dîsa Zabite û polîs diçin li taxa "Yenîkapi" bela xwe li hevalê seyar dixin. Çiqas heval dengê xwe dernaxînin jî, ew heqareta xwe didominîn. Pişt re di nav zabite, polîs û seyarfiroşan de qirên dertê, çend zabite birîndar dibin. Çend jî seyarfiroş tên girtin.

*Heta niha zabiteyan erebeyên te birine?*

– Belê beriya mehekê Zabiteyên "Anakent"ê, hatin û erebeya min birin.

*Careke din dane te?*

– Na... Na. Gava Zabiteyên "Anakent ê" erebeyan dibin, careke din nadin mirov, dibin diavêjin xurde.

*Ên din?*

– Ên din jî ceza dibirin. Doh hatin 72 hezar cezayê pere dane min û çûn. Ev ku erebe nebirbûn wisa bû ku, erebe bibirana wê hengê ceza dibû 150 hezar.

*Polîs çima tên û bela xwe ji we venakin, qey ne karê zabite ye?*

– Polîs û zabite bi hev re di têkiliyê de ne. Bi şev polîs li şûna zabite dinihêrin, bi roj jî Zabite li şûna polîsan dinihêrin. Bi qanunî, saet piştî 5'ê evarê gere tu kes ji me xeber nede. Lê polîs nahêlin. Wek min berê jî got, me tehdît dikin û nahêlin em bi rehetî heqê nanê xwe derxin.



Li metropolan karek ji seyarfiroşiyê yê Kurdan firotina gilgil e.

*Hûn nû ji welat hatine. Bi dîtina we rewşa welat çawa ye?*

– Gelek baş e. Lê li welêt tu kar tune. Tenê şer heye, her roj di televizyon û rojnameyan de dihatin gotin ku, filan gund hatiye şewitandin, hewqas kes hatine birîndar kirin, çend heb hatine kuştin, nizam çend jî binçav kirin. Halê welat bi dîtina min wiha ye.

*Gava hûn li welat bûn, qet hûn xistin binçav?*

– Belê, gava li gundê me bûyêr çêdibûn, gundiyan tev berhev dikirin, 3 car ez jî birim. Li meydanekê em tev rûniştandin û qala nebaşiya PKK'ê kirin li ba wan PKK, hê jî "terorîst" e.

*Li we işkence kirin?*


– Ma hertiştê wan ne işkence ye? Mirov li nava gund dinihêrt her serê malê 3–4 tîmên taybetî, nava gund du car ji gundiyan zêdetir leşker, cahş û polîs li serê me firok û balefir. Ji xeynî van jî heqareta ku dikirin. Serbazê wan ê mezin di firokê de bi ser me re xwelî direşand.

*Li ser zimanê Kurdî çi difikirî?*

Ez bi zimanê niviskî hê baş nizanim. Lê ez dixwazim baş hîn bibim. Hinek jî kêmasiya me ye ku em li benda dibistanekê ne...

*Tiştekî ku me nepirsî hûn bixwazin bibêjin heye?*

– Saxiya we divêm...



Gilgilfiroş jî weke hemû seyarfiroşan ji aliyekî ve di bin pesta zabiteyan de, jî aliyê din ve ji di bin pêkutiyên polîsan de ne.

# Neqitk

Ez ne ji pirtukên Marks fêrî azadiyê bûme; di nav xizaniyê de ez fêrî wê bûm.

*Albert Camus*

# Ma heqê Xwedê ye



Yekî Xiyî tiriyê xwe tîne li irasa Farqîne difiroşe. Em bibêjin li gorî wê hengê bi 2,5'an. Pişt re birçî dibe. Ji xwe re difikire çi bixwe.

Mala xwediyê xizaniyê bişewite, divê ji xwe re tiştekî erzan bixwe. Biryara xwe dide ku nan û tirî bixwe. Ê jixwe karwan xurika wan nanê firinê, helaw, firingî, xiyar û zebeş, petêx, tirî û hwd. bûye. Dîçe cem zilamê ku tiriyê xwe firotiyê. Jê kîloyek tirî dixwaze. Zilam tirî diwezinîne û didiyê. Pişt re jî, ji bo heqê tirî jî 5 baqnot (lirayê Tirk) dixwaze. Dema dibihîse hiş di serî de namîne çavên wî soro moro dibin, dinya li ber çavên wî diçe tê. Hema xwe ranagire û destê xwe dirêjî qaseya tirî dike û li nav rastê bela wela dike. Dilê wî rihet nabe, bi piyan radibe ser tirî dipelçîne û wiha ji xwe re dibêje: – Hey bavo, hey kure çi. Te çima nedigot li Farqînê birayekî te yê din jî tune ye. Ez sal û dozdeh meh rez xwedî dikim, hiltînim, datînim. Kiloyê bi 2,5'an difiroşim. Ew bi 5 baqnotan difiroşe. Ma heqê xwedê ye?

***Berhevkar: Silêmanê Kal***

# 'Bijî PKK bijî PKK'

**(Dimilî)**

Serri 1984 di wexto ki gerîlayanê PKK dest bi lejdê çekdarî kerd. Eylema xwi na ewilî 15 Axustos di vist bi qezada Eruhî ser. Gerîlayanê qahremanan yew pirodayiş da bi dewleta faşist ro ki, nêverda çimanê xwi akê. Gerîlayên dewleta Tirkan a faşisti hewn di tepişt bî.

Gerîlay wexto ki qeza îşxal kenê, yew yuzbaşî û mudirê postî zî esîr gênê. Gerîlay yuzbaşî xwi dir gênê benê. Mudirê postî rê zî armancê lejê PKK'î û Kird û Kurdistanî vanê. Xêlêk propaxanda ra pey, gerîlay mudirdê postî ra vanê, vaji; "Bijî PKK, bijî PKK". Mudir, vano: "Bijî PKK, bijî PKK." Welhasil xêlêk propaxanda ra pey, gerîlay mudirê postî verdanê. Mudirê postî tersan ver a weqifiyeno. Gorebê yew, di hewtî tersana saw mudirdê postî serkuweno. Wextono ki rayîd di şono, xwibi xwi qalî keno, vano: "Bijî PKK, bijî PKK". Rojê mudirê postî serê şewra kêde xwi ra vejîyeno ki şoro guredê xwi ser, rayîd di yew dostê jê (yê) leqa jê beno. Dostê jê, vano: "İyî sabahlar mudir bey! (Roj baş mudir beg!) Mudirê postî vinciqîyeno, holbeno qîreno, vano: "Bijî PKK, bijî PKK." Dostê mudirî vano: "Mudir bey hayirdir, ne oldu? (Mudir beg xêro, sebi? Mudir vano: "Yaw sen misin, korktum, dedim belki yine PKK gerîlaları geldîler. (Yaw tîy a, ez tersaya, mi va qay rana gerîlayê PKK'î amê)


***Mihem Himbêlij***

## Jûjî...

Doğan Güzel




# TÎR



**Musa Anter**

## Apê Musa

Daxwaziya min bû ku, bêm rojekê bi destê te bigirim. Bibêjim "Bi nasbûniya we ve pirr şa bûm." Lê belê nebû qismet. Min ew derfet nedît. Heya 20'ê meha Îlonê, şeva tarî.

Herçî nivîsa te di rojnameyan de derketibe pêşiyê min ew xwendine. Nivîsên te bûbûne pirseke klasîk ji bo xortên şoreşger. Dema çend xort li hev biciviyana, miheqeq wê yekî ji wan bigota: "We nivîsa Apê Musa xwendiye?" Nivîsa te ya li ser "Huseyîn Denîz" nivîsî, min xwend. Min hizrên xwe kirin, herçî ku min tu nenasîba, minê bigota Musa xortekî 22 salî ye. Lê emrê te bûbû 80 sal.

Hizrên xwe dikim. Ji bo şehîdbûna te emê xemgîniyê bikin an şînahiyê. Ev pirs hê jî di serê min de nehatiye çareserkirin.

Lê, şeva 20'ê Îlonê min di xewna xwe de didît, rûbarekê şolî di ber zozanê me de dibore. Zarokên 7–8 salî dikin qîrîn û gazî. Tu fêm min jê nekirin kanê çi diqewime. Bi tirs ji xew hişyar bûm. Direcifim. Min yeqîn kir ku, wê nûçeyeke nexweş ji bo min bê. Lê belê min qet hizra şehîdbûna te nekir. Lewre nedixwestim wê hizrê bikim jî.

***Şeva 20'ê Îlonê min di xewna xwe de didît, rûbarekê şolî di ber zozanê me de dibore. Zarokên 7–8 salî dikin qîrîn û gazî. Tu fêhm, min jê nekirin kanê çi diqewime. Bi tirs ji xew hişyar bûm. Direcifim. Min yeqîn kir ku, wê nûçeyeke nexweş ji bo min bê. Lê belê min qet hizra şehîdbûna te nekir. Lewre nedixwestim wê hizrê bikim jî.***

Dema min serê xwe danî ser balgihê. Wê carê min dît ewrên reş û tarî cihê xwe ji bo tîrêjên heyvê hilaye. Mehtabeke pirr geş tîrêjê dide zozanê me. Rûbarê şolî cihê xwe daye aveke zelal. Zarokên ku dikirin qîrîn û gazî, li ber rûbara zelal dikin kêf û seyran.

Belê Apê Musa! Emê cihê te bi zorê tije bikin. Daxwaziya min bi cih nehat. Min nasbûnê li gel şexsê te nekir. Lê me soz û peyman ji bo te daye ku, emê ala te nexin erdê heya dawiyê.

Çi bibêjim tu nemir î û namirî. Bila kedxwar şermê ji halê xwe bikin. Bila dagirker rûreş bin.

Em serfiraz in. Di qebra xwe de bi dilxweşî razê. Lewre Çinara te çandî bingeha xwedî rehên pirr saxlem e.

***Adil Zozanî***

**NIVÎSKARÊ QEHREMAN**

Apê min qehremanekî nivîskar bû
Pênûsa wî ji dijminan re kîmyasal bû
Êvîna Apê min xelasiya Kurdistanê bû.

Ma we nedît ji bo Kurdistanê can feda kir
Ûn gelê Kurd, gere rêça wî dom bikin
Sîleha wî pênûsa wî bû, gere em wê bilind bikin
Azadî pirr nêzîk e, ku em torinê wî bin.

***Torinekî Apê Musa***
***Tilmerç/Îluh***

*Dewlet êdî nikare qereqolên xwe yên biçûk biparêze, hêzên xwe vedikşîne nav qerrgehên mezin. Li ser vê yekê ;*

# Gerîla berê xwe dide tabûran

● *Di herdu mehên dawî de, hêzên ARGK'ê êrîş birin ser 8 tabûran. Dewleta Tirk a ku nikaribû qereqolên biçûk biparêze û leşkerên wan qereqolan dikişandin nav tabûran, vê gavê jî leşkerên hin tabûran vala dike û hêzên wan avahiyan di wargehên hin mezintir, wek tumen û tûgayan de dicivîne.*

**Navenda Nûçeyan–** Ji destpêka şerê piştî şerrawestinê ta rojên dawî, livbaziyên PKK'ê yên li hemberî hêz û saziyên dewleta Tirk her diçin zêde dibin. Di nava van livbaziyan de, yên herî balkêş jî, êrîşên ser tabûran in. Tabûrên ku di wan de bi sedan leşker hene, dibin hedefên cerdên hêzên ARGK'ê. Di van cerdan de gelek leşker û serbazên Tirk têne kuştin, revandin û hin ji wan tabûran, bi qismî tên rûxandin an jî şewitandin.

Di herdu mehên dawî de, hêzên ARGK'ê êrîş birin ser 8 tabûran. Dewleta Tirk a ku nikaribû qereqolên biçûk biparêze û leşkerên wan qereqolan dikişandin nav tabûran, vê gavê jî leşkerên hin tabûran vala dike û hêzên wan avahiyan di wargehên hin mezintir, wek tumen û tûgayan de dicivîne.

Ji destpêka şerê çekdarî ku bi êrîşên ser qereqolên Dihê û Navşanê xwe nîşan da, heta vê gavê bi sedan qereqolên biçûk an jî mezin bûne hedefa livbaziyên gerîla. Di nava van qereqolan de, bi dehan jê, bi temamî hatine hilweşandin û şewitandin. Ên din jî, derbeyên pirr dijwar xwarine.

Ji ber ku dewlet nema dikare van qereqolên gundan, an jî yên li ser riyan ku ji navenda bajaran dûr in biparêze, hêzên xwe yên li van qereqolan vedikişîne qerargehên mezin û hêviya xwe ji wan dibirre. Hin qereqolên ku mane jî, an qumandarên wan bi gerîla re li hev tên û haya xwe ji tiştekî naynin, an jî, ji aliyê leşkeran bi xwe tên şewitandin û dibêjin gerîla êrîş kiriye da ku dewlet wan jî bikişîne qerargeh û avahiyên mezintir ên li navenda bajaran.

Bi sedan qereqolên biçûk ên gundan û yên li ser riyan, îro ew çend hindik mane ku bi tiliyan dikarin bêne hejmartin. Ên ku mane jî, bi giştî yên deverên ku lê cerdevan gelek in û ji aliyê cerdevanan ve êdî zehf tên bikaranîn û parastin.

Di cerdên dawî yên ku gerîla di mehên Tîrmeh û Tebaxê de birin ser van qereqolan de, careke din baş hate fêmkirin ku, pirranî ji hêla cerdevanan ve têne parastin. Ji ber ku di van êrîşan de gelek cerdevan hatin kuştin. Leşkerên ku li van qereqolan hene jî, dernakevin derve û tim di hundir de xwe vedişêrin. Ên ku li derve nobet digirin û dikevin kozikan cerdevan in.

Wisa xuya dike ku dewletê hêviya xwe bi temamî ji van wargehên biçûk birriye. Bes hêzên ARGK'ê êrîşên xwe li hember van qereqolên cerdevanan didomînin û hêdî hêdî dest bi rûxandina tabûran dikin.

Di mehên Tîrmeh û Tebaxê de, zêdeyî 30 qereqol û nêzîkî 10 tabûr bi êrîşên gerîla an hatin hilweşandin û şewitandin, an jî derbên mezin standin. Ji van qereqol û tabûran ên ku me tesbît kirine ev in: Dihê, Dembê (Düzyamaç) li ser Navşanê ye, Keçelî (Gever), Hirfasê (li Qubînê), Herendê (gundê Sason), Kerboran, Halkari (gundê Pilemorî), "Tanriyar" (li ser riya Bilîs û Amedê ye), Şêxêman (li Çepekçûr), "Yenîdoğan" (li Aralik), Xîzan (navçeya Bilîsê), Avrek (gundê Darahênê), Mîlakarê (li Şirnex), Çelîk, Bostanci (gundên Kerboran), Tîsî, Çatak (gundên Navşan), Timoq (gundê Hezo), Sûveren, Sazak (gundê Darahênê), Belijîn (Şirnex).

Tabûrên Keryares (Silopî), Zevê (herêma Harûnan), Qubînî, Güzeldere (gundên Darahênê–Genc), Îkîzce (Şirnex), Îgnelî (Berwarî) û ya Sasonê.

## ROJEVA WELÊT

### Serpilka dengeyeke nû

Li Kurdistanê qereqolên biçûk ji holê radibin. Ên ku hene jî, an ji aliyê cerdevanan ve têne parastin, an jî dewlet hêzên xwe ji wan vedikişîne qerargehên mezintir ên li navendên bajaran.

Heta berî çend salan li çar aliyên bakurê Kurdistanê ji van qereqolan bi sedan hebûn. Zehfên wan bi êrîşên hêzên ARGK'ê hatin rûxandin, an jî tehrîpkirin. Ên saxlem jî, hertim li benda cerdên din bûn. Dewleta Tirk nedikare wan biparêze û ji bêmecalî hêzên li van avahiyên qereqolan li tabûr an jî tumenan kom kirin.

Her çiqas ev qereqol, bi temamî ji holê ranebûbin jî, êdî di warê parastina dagirkeriya dewleta Tirk de ne xwedî rolên girîng in.

Hêzên ARGK'ê jî, bi kêmbûna qereqolên biçûk re, berê şerê xwe fireh dikin. Heta berî bi demekê gund û deştên ku bi hêzên dewletê yên li van qereqolan dihatin kontrolkirin û bi temamî nediketin bin bandora gerîla, vê gavê, êdî bi şev di destê gerîla de ne. Bi roj jî, dewlet tenê bi operasyonên mezin, an jî bi balefiran ji bo çend saetan dikare kontrol bike.

Yanî her diçe berê têkoşîna gerîla vedibe, warên ku dike bin kontrola xwe firehtir dibe. Li hember xurtbûn û berfirehbûna têkoşîna gerîla, tesîr û kontrola dewletê jî berevajî kêm û qels, warê wê jî teng dibe.

Bi awayekî din ku bê gotin, têkoşîna PKK'ê ya çekdar, hêdî hêdî xwe digihîne serpilkeke (merhaleyeke) nû. Ev merhale raste rast a dengeyê (mêzîn) ye.

Ji bo rizgariya gelên bindest, di riya şoreşê de, ev pêvajoyeke pirr girîng e. Serpilka dengeya stratejîk, mizgîna berbanga şoreşê ye.

Di dîroka gelên din ên bindest de jî hatiye dîtin ku, dema têkoşîna rizgariyê xwe gihandiye vê merhaleyê, têkçûna wê bêîmkan dibe û nema kes dikare rê li ber serfiraziya wê bigire.

*Serokê DEP'ê Yaşar Kaya li ser kongreya PDK'ê pirsên me bersivandin:*

# 'Nûnerên Partiyên Tirk durûtî kirin'

*Birêz Yaşar Kaya di komcivîna 11. a PDK'ê de bi giştî tiştên bala we kişandin çi bûn û li gor we cihêrengiya vê kongreyê çi bû?*

– Ev cara yekemîn e ku bi awayekî azad kongreyeke PDK'ê li Kurdistanê tê li darxistin. Di vê kongreyê de, ji gelek welat berpirsiyar an jî nûnerên partiyên siyasî beşdar bûn. Gelek şexsiyetên Kurd ên girîng wek Îsmet Şerîf Wanli, Prof. Hesretyan, Şakirê Xudo û hwd.jî hatibûn kongreyê.

*Ji xeynî PKK'ê, hemû rêxistin û partiyên Kurd hatibûn dawetkirin. Hûn dibêjin, çima wan PKK nevexwendibû kongreyeke wiha girîng?*

– Muxabîrê BBC'ê ev pirs ji Berzanî kir. Berzanî gote ku di navbera wan û PKK'ê de hin mesele hene, ji ber vê yekê gazî nekirine. Bi rastî, bi beşdarbûna me jî PDK zêde kêfxweş nebû.

Roja pêşî ku em çûn Hewlêrê, Waliyê Hewlêrê beşdarên kongreyê dawetî xwarinê kir, lê ez beşdar nebûm. Ji ber ku di vê ziyafetê de rêxistina Vejîn û yên wek wê hebûn bi giştî.

Min got, cihê ku Yekîtî û PDK lê hebin, em jî hene, wekî din em bi her rêxistin û kesî re ranabin û rûnanin.

Xeberdana ku min li kongreyê anî ziman pirr deng da, radyoya BBC jî pirr li ser axaftina min sekinî.

*Di kongreyê de, di nav beşdaran de ji ber venexwendina PKK'ê kesî rexne li PDK'ê negirt?*



Serokê Giştî yê DEP'ê Yaşar Kaya

– Na kesî tiştek negot, lê di kulîsan de rexne li PDK'ê dihate kirin û herkesî dipirsî ka çima PKK di komcivîneke wiha girîng de tune.

Nebûna PKK'ê an jî nevexwendina wê ji aliyê PDK'ê ve têkiliyên PDK, Amerîka û Tirkiyeyê tîne bîra mirov.

*Bi ditîna we ihtîmal tune ji ber ku Tirkiye û Amerîkayê nexwestine, PDK'ê jî ew dewet nekiriye?*

– Belê ihtîmal heye ku PDK şêwra xwe bi hikûmeta Tirkiyê re kiribe.

Tewra partiyên siyasî yên Tirk di kongreyê de çawa bû?

– Partiyên Tirk di kongreyê de durûtî kirin. Digotin em hez dikin ku heqên Kurdan bên dayin, lê di rastiya xwe de li Tirkiyê dijberên mafên Kurda ne.

Lê dîsa jî, ji xeynî nûnerên partiyên siyasî yên Tirk navê Kurd û Kurdistanê di maneyeke siyasî têvan de tenê Partiya kurê Menderes behsa Kurd û Kurdistanê kir.

***Hevpeyvîn: M. Rojava***

# Çelê û Kerboranê jî koç bar kirin

**Navenda Nûçeyan**–Piştî êrîşa 18'ê Tebaxê ya hêzên dewletê ku, avahiyên Çelê bi gullebaran û topan rûxandibûn, gel bi koçemalî ji Çelê derdikevin. Heta niha zêdeyî 60 malî ji Çelê koçber bûne. Xelkên ku, ji Çelê derdikevin li Cûlemêrgê, Wanê û gundên cînar bi cih dibin. Xelkên ku hê ji Çelê derneketine daxuyandin ku, ger operasyonên dewletê bidomin dê Çelê tevî gundên xwe vala bibe.



*Heyetên ku ji bo lêkolînê çûn Geverê di bûyerên bi vî rengî de berpirsiyariya hêzên dewletê îsbat kirin.*

Li Kerboranê jî, êrîşeke bi vî rengî roja 24'ê Tebaxê pêk hat. Hêzên leşkerî, avahî û dikanên gel bi topên hewan û bi gullebaranê rûxandin. Êrîşa hêzên dewletê, ji êvarê ta serê sibehê domand. Leşker ji du milan êrîşî avahî û dikanên Kerboranê kirin. Milek jê ji Tabûra Cendirmeyan bi topên hewanê, yên din jî, ji nava bajêr bi panzêran êrîş kirin. Piştî vê êrîşê nêzîkî 15 dikanên esnafên Kurd jî bi benzînê şewitandin. Bi sedan sewalên Kerboraniyan bi gullebaranên leşkeran mirin.

Ber bi sibehê ve, bi rawestina êrîşa leşkeran re, Kerboranî dest bi koçberiyê kirin. Heta niha çend mal ji Kerboranê derketine ne kifş e.

Hêzên dewletê, li gor bernameya xwe ya 'Şerê bi Giştî', êrîşên xwe yên li hember gund, navçe û bajarên Kurdistanê didomînin. Heta niha bi sedan gund û navçe bi êrîşên hêzên dewletê hatine valakirin. Bi sedan gundî di van êrîşan de hatine kuştin û bi hezaran jî birîndar hene. Êrîşên li hember navçe û bajaran, di Newroza 1992'yan de bi êrîşa ser Şirnexê re dest pê kiribûn. Dû re jî Kerboran, Çelê û bi dehan navçeyên din bi vî awayî hatibûn rûxandin. Piştî dawîleanîna şerrawestina PKK'ê ya yekalî, Dewleta Tirk qetlîamên girseyî daye pêşiya xwe. Bi van qetlîaman armanc, valakirina gund û navçeyên Kurdistanê ye. Ji bo pêkanîna vê armancê jî, her roj gund an navçeyek, bi qetlîamên barbar tê valakirin.

Piştî cerda ser Gîhadînê û Miksê, niha jî li Gever, Çelê û Kerboranê, ji bo gel ji herêmê bidin revandin êrîşên bi giştî pêk tên. Bi dû cerda ser Geverê, ya ku di 15'ê Tebaxê de pêk hatibû û gelek avahî bi çekên leşkerî hatibûne rûxandin, serdanên heyetan dest pê kir û derkete holê ku, dewlet li hember gel programa qetlîaman dimeşîne. Li gor raporên heyetan, hêzên leşkerî li Geverê, gel dane ber gulleyan û 2 kesî kuştine, bi dehan ji wan jî birîndar kirine. Ev yek xwe di beyanên birîndaran de jî diyar dike. Weke tê zanîn, bi dû vê êrîşa ser Geverê re, gel dest bi koçberiyê kiribû û pirraniya wan li Wanê bi cih bûbûn.

Hêzên leşkerî, roja 18'ê Tebaxê, li Çelê jî êrîşeke bi vî rengî pêk anîn, gelek avahî rûxandin, mirovek hate kuştin û bi dehan kes jî birîndar bûn. Di vê girtina ser Çelê de 23 kes jî ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin û heta niha ji wan tu agahî nîn e. Koçberbûna gel jî bi vê êrîşê re dest pê kir û heta niha zêdeyî 60 malî ji Çelê koç kirine. Ên mayî jî daxuyandin ku, ger cerd û pêkutiyên hêzên dewletê bidomin, dê gelê Çelê tevî gundan dest bi koçberiyeke giştî bike.

Roja 24'ê Tebaxê, îca jî li Kerboranê hêzên dagirker li ser kar bûn û avahiyên gel bi çekên giran dikutan. Piştî vê êrîşa barbar, ji Kerboranê jî koçberî dest pêkir. Xelkê Kerboranê hemû hebûnên xwe di cih de dihêlin û axa xwe ya sedan salan vala dikin.

# Li Amedê 'Festivala Aştiyê' çêdibe

**Navenda Nûçeyan**–"Platforama Demokrasiyê" ya ku nêzîkî ji sih rêxistinên demokratîk ên girseyî, sendîka û ji nûnerên partiyên siyasî pêk tên, biryara çêkirina "Festîwala Aştiyê" dan. Li gorî biryarê, dê "festivala Aştiyê" di 3-4'ê meha Îlonê de li bajarê Amedê li dar bikeve.

Ji bo destûrstandinê jî, serî li walîtiya Amedê (Diyarbekir) hat lêdan. "Platforma Demokrasiyê", ji bo vexwendina Festiwala Aştiyê gazî gelek nivîskar, hunermend, parlementer nûnerên balyozxaneyên biyanî jî kirin.

Doç. Dr İsmail Beşîkçî, Serokê YNK'ê Celal Talebanî, Serokê PDK'ê Mesut Berzanî nivîskar û Huquqzan İsmet Şerîf Wanli , Romannivîs Mehmed Uzun rojnamevan Ragip Duran, İsmet İmset, Ragip Zarakolu, İlyas Salman, Cengîz Çandar, M. Alî Bîrand, Ferhat Tunç, Koma Mezrabotan, Koma Dengê Azadî, Ahmet Kaya hunermendê Spanyolî Enridqie Cioneros

Di nav vexwendiyan de Serokê Partiya Demokrasiyê Yaşar Kaya, nivîskar Yalçin Küçük, Serokê Giştî yê Petrol-İş'ê Münîr Ceylan, Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Akin Bîrdal û Serokê ANC'ê Nelson Mandela hwd. hene.

Di komîteya sazkirina "festivala Aştiyê" ya platforma Demokrasiyê de ev kes cih distînin: Sedat Aslantaş (Serokê Şaxa KMM'ê ya Amedê), Mesut Değer (Serokê Bajarê Amedê ye CHP'ê) Edip Yildiz (Serokê Bajarê Amedê yê DEP'ê ) Halîl Öztopalan (Serokê Şaxê 1. No. yê Yol- İŞ'a Amedê) Alî Öncü (Serokê Şaxê Test-İş'a Amedê) Dr. Hasan Güneş: (Endamê Heyeta Kargêriya Şaxê Odeya Tabîban ê Amedê) û Nevîn Soyakaya.

# Piştî meşa 15'ê Tebaxê Melazgir


**Encî Egît**

Mirov dikeve nav girsên gel, ku mirov têkoşînê bi çavê xwe temaşe dike, ku mirov li hember zilma hêzên dagirker ên ji xeynî kuştinê tu reçeteya wan tune ye, gelekî bi bîr û bawerî dibîne. Mirov vê rastiyê jî careke din keşf dike û dibîne ku, îdeolojiya fermî li Kurdistanê riziye û bi carekê mehkûmê mirinê ye. Gel êdî guh nade zagonên KT (TC)'ê. Gelê Kelê (Melazgirê) Panzdehê Tebaxê bi gef û gur ji dil û can, bi xwîna xwe, bi canê xwe, bi malê xwe pîroz kir. Belê îdeolojiya fermî li Kurdistanê li ber sikratê ye. Ecel qewimiye. Par 15'ê Tebaxê Kelê şehîdek dabû 'Faruk Eren'. İsal şehîdên wê çar in. Par birîndar jî yek bû, îsal birîndar ji bîst kesan zêdetir e. Ên azadîxwaz, ên destvala, ên karker û gundî û rêncber, ên ku ji wan re dibêjin "gundiyên nezan", bi kal û pîr û jin û zarokan ve, wek rewşenbîran bûn kom bûbûn û dimeşiyan û raste rast doza mafê xwe dikirin. Bi siyasî doza mafê xwe dikirin. Belê lebat siyasî bû. Lebat yekrû siyasî bû. Li cem gel çek û gulle tune bûn. Gelê Kurd doza legaliya hebûna xwe û doza legaliya partiya xwe dikir. Kal, pîr, jin, zarok, karker û rêncber. Bi devekî, bi dengekî, bi sondekê, bi rewşekê; dehhezar deng: "Bi xwîn, bi can em bi te re ne ey Serok", "Bijî Partiya Karkerên Kurdistan", "Bijî hebûna me". Deh hezar însan, deh hezar deng: Bijî PKK...

Li hemberî gelê destvala, bi hezaran Ramboyên dest biçek, bi sedan top û tanq, bi dehan panzêr li ser serê koma gel, koma jin, zar, kal, pîran nizim difirîn balefir. Hîn jî tîm û leşker ditirsiyan û alîkarî dixwestin jî qezayên der dor. Ji Patnosê hêzên leşkerî bi zehfî li hewariya wan hatin. Dest bi qetlîamê kirin. Dest bi xebata panzer û çekan kirin, gel gullebaran kirin... Ên wan çekê wan, panzerê wan, top û tanqê wan, balefirên wan û bi hezaran Rambo... ya me qîrîna dayîkan: "Tîlîlîlî..." Gulle çare nebû, tu feydeya çeka wan, ji wan re tune bû. Dîsa reçete wek her dem çewt nivîsîbûn. Li hember zilm û zorê dayîk qewîn, dergûş jîr bûn. Jineke bûkin bi dergûşa li ber pêsîra xwe ve, tevî meşê bûbû. Qomandoyan jinê dan ber qûndaxan û jê re dan çêran. Ji hêrsan çavê jinê fire bûn, kîna xwe da der. Bi qîrîneke: "Faşîstên pîs" dergûşa xwe ji kerba xwe ve avête ber lingê wan kire qîrîn, "Dergûşa min bikujin, bikujin dergûşa min. Min jî bikujin, hûn êdî nikarin me bi kuştinan bitewînin, me tirsa mirinê kuştiye, em bi kuştinan natewin." Dergûş, ma di destê pê neyaran de, jin deng dan hev: "Tîlîlî..." Neyar weke her dem hûr û horum bû. Jina ku ji komê veqetandana, dikirin bin piyê xwe; tazî dikirin, didan ber qûndaxan. Dayika Xezal jineke şêst û pêncheftê salî ye. Zehf zilm ji neyaran dît. Dîsa jî netewiya heya dawiyê, gotinên wê ev bûn: "Zarokino, destê min zexim bigirin heta hûn dimeşin min bimeşînin. Min bigihînin kuçê Kelê, min bibin bi pûtê Atatürk ve girê bidin û agir berdin min. Min bişewitînin, bila ez û vî pûtî tev bibin xwelî. Belkî êdî zarokên me ji zilma Tirk xelas bibin."

Par şehîd yek bû, îsal ji bo azadiyê çar in. Ew roj 4 şehîd, zehfên wan jin. Ji bistî zêdetir birîndar bûn. Birîndar bi zehfî jî, jin in. Roja 16'ê Tebaxê esnaf bêdeng neman, li lebatê silav kirin. Bersiva dewletê dan, hemû esnafan kepeng dadan. Dema ku ez nivîsa xwe diqedînim, pê dihesim dewletê derî, pace û dikanan şikandine.

# PÊNÛS



Amed Tîgrîs

## Bihayê xwefiroşan heta cihekî ye

Dîtineke dîrokî û cirbandî heye ku, "ew kesê ku ji xelkê xwe re nebe, ji xelkê din re tu car nabe." Ev dîtin, dîtineke navneteweyî ye û li her derê dinyayê derbas dibe. Bi taybetî di nav Kurdan de, di vî warî de gelek mînakên berbiçav hene.

Wekî ku tê zanîn di dema Mustafa Kemal de di parlamentoya Tirkiyê de Diyap Axa, Hasan Xeyrî û hinek parlamenterên wekî wan hebûn. Ew Kurd bûn. Dema Tirk di polîtîka xwe ya derveyî de ketin tengasiyê parlamenterên ku bi eslê xwe Kurd bûn, derxistin meydanê. Bi taybetî di Lozanê de dema Îsmet Înönü di hêla doza Kurd de kete tengahiyê, Mustafa Kemal, bi yekî wekî Diyap Axa re kete paytonan û fotograf kişand. Emîr da Hesen Xeyrî û çend kesên din ku, "ew bi cil ûbergên xwe yên Kurdî ve bêne parlamentoya Tirkiyê." Bi wan name da nivîsîn ku, "Kurd mafê xwe yê neteweyî naxwazin. Kurd û Tirk herdu xelk jî misilman in û ji sed salan ve di nav sînorên Osmanî de bi hevdu re wekî birayan jiyan e.." Wiha jî kirin. Mustafa Kemal û Îsmet Înönü piştî ku li Lozanê karê xwe temam kirin, vê carê ji ber ci û bergên wan ku li xwe kiribûn û hatibû parlamentoyê, wan di Mehkemeyên Îstîklalê de bi parvekariyê sûcdar kirin û di dawiyê de jî ew bi dar ve kirin.

***Li Kurdistanê her ku şer û têkoşîna neteweyî bi pêş ve here û dagirkerên Tirk bikevine tengasî, dê wê demê ev dîtin di nav Tirkan de zelaltir û diyartir bibe. Êdî xwefiroşî û xulamtî dê pere neke. Dem ne dûr e ku Fehmî Işiklar, Hîkmet Çetîn, Mehmet Kahraman û qasî 200 parlamenterên Kurd ên din wekî Hesen Xeyrî di sêpiyan de bileqin.***

Piştî 70 salî dîsa di parlamentoya Tirkiyê de eynî bûyer nûcar dibe. Vê carê parlamenterê HEP'ê yê bajarê Amedê Fehmî Işiklar derdikeve holê. Wekî ku tê zanîn û bîranîn, Fehmî Işiklar xwest ku 18 parlamenterên Kurd bi partiya wan HEP'ê ve bifiroşe û teslîmî dewleta Tirk a dagirker bike. Lê bi ser neket. Ew bi serê xwe ma. Mecbûr ma û xwe firot. Ew kirin Alîkarê Serokê Parlamentoya Tirkiyê. Di dawî de dîtin ku bawerî bi Fehmî Işiklar nayê. Karê xwe pê kirin û qedandin. Di pêngava pêşîn de parlamenteriya wî rakirin. Niha Fehmî Işiklar ne parlamenter e. Bi ser re jî ew dane mehkemeyê ku di dema hilbijartinê de wî behsa Kurdan û demokrasiyê kiriye. Ji ber vê yekê jê re îdam dixwazin. Ma bi tenê Fehmî Işiklar e?

Hêdî hêdî dor tê ser Wezîrê Derveyî yê Tirkiyê Hîkmet Çetîn jî. Polîtîka derve ya Tirkiyê têk çû. Li Bosna–Hersek, Qibris û li Azerbeycanê Tirkan winda kir. Li ser windakirin û têkçûna polîtîka der a Tirkiyê, ji niha ve gotûbêj û şîroveyên tûj û dijwar hene. Di rojname û TV'yan de rexneyên tûj û dijwar li Wezîrê Derveyê Tirkiyê li Hîkmet Çetîn dikin. Şîrovevan û rojnamevanê Tirk ên bi nav û deng dibêjin ku, têkçûna polîtîka Tirkiyê ya derve bi Hîkmet Çetîn ve girêdayî ye. Ji ber ku Hîkmet Çetîn Kurd e, ew bi zanebûn û mexsûs dixwaze polîtîka Tirkiyê ya der têk biçe.."


Helbet ev ne rast e. Ji ber ku Hîkmet Çetîn, xwefiroşekî sadiq e. Xulamekî wekî wî li Kurdistanê kêm e. Ji bo ku xwe bide îspatkirin û ew li dijî gelê Kurd e, çi ji destê wî hat kir û dike. Li derve di warê navneteweyî de ew baş li dijî Kurdan bi kar anîn. Êdî ne batarî û ne jî enerjiya wî maye. Vala û pûç bûye.

Em werin ser gotina, "ew kesê ku ji xelkê xwe re nebe, ji xelkê din re tu carî nabe." Xêr û fêdeya wî/wê tune di pratîkê de derdikeve holê. Kesê ku dijminê xelkê xwe be, ji xelkê din re nabe dost, ev dîtin îro bi cih tê. Li Kurdistanê her ku şer û têkoşîna neteweyî bi pêş ve here û dagirkerên Tirk bikevine tengasî, dê wê demê ev dîtin di nav Tirkan de zelaltir û diyartir bibe. Êdî xwefiroşî û xulamtî dê pere neke. Dem ne dûr e ku Fehmî Işiklar, Hîkmet Çetîn, Mehmet Kahraman û qasî 200 parlamenterên Kurd ên din wekî Hesen Xeyrî di sêpiyan de bileqin. Heger ew li hêla Tirkiyê bimînin dibe ku, ew aqûbet bê serê wan. Lê, heger birevin û vegerine Kurdistanê, gelo dê wê demê gelê Kurd çi bîne serê wan?

*Di civîna li ser alfabeya Kurdî ya Latînî de encama ku derkete der:*

# Divê alfabe bê hêsankirin

Mehmet Gemsiz





*Zimanzan Feqe Huseyn Sağniç û Serokê Kargêriya Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê Şefîk Beyaz di gel hev.*

Li Navenda Çanda Mezopotamyayê civîna li ser ziman a bi navê **"Gelemşeyên alfabeya Kurdî"** ya Latînî ya duyemîn, roja 21'ê Tebaxê, saet di 11.00'an de çêbû.

Di vê civîna duyemîn de jî meyla guherîna tîpên **"i"**yê bi **"ı"**yê û **"î"** jî bi **"i"**yê derkete holê. Beşdarên ku di civînê de nêrîn û ramanên xwe der barê alfabeyê de bi lêv kirin daxuyandin ku, alfabe bi vî rengî ji aliyê pedegojiyê ve hin gelemşeyan bi xwe re tîne û divê alfabe ji wî aliyî ve were hêsankirin.

Civîna duyemîn a li ser gelemşeyên alfabeya Kurdî ya Latînî bi axaftina **Nîjad Yaruk** vebû. Yaruk diyar kir ku, li ser navê rojnameya Welat beşdarî civînê dibe û di vî warî de dîtin û fikrên Welat tîne ziman. Yaruk: "Bi ya me diviyabû ku Enstîtu, cara pêşîn li ser rastnivîs an jî klaviyeya Kurdî rawestiya. Lewre pêdiviya me bi wan hene. Ji aliyê din ve, em guherîna alfabeya Kurdî ji bo niha di cih de nabînin. Em difikirin ku, ji vî karî re pêdiviya me bi demeke dirêj heye. Em bi xwe jî qebûl dikin ku, di alfabeyê de kêmasî hene. Lê divê em a niha dest nedinê" got.

Ji rojnameya Azadî **Latîf Epözdemîr** li ser alfabeyê û li ser rengê Enstîtuyê wiha peyivî: "Berî her tiştî divê Enstîtu xwedî rengekî bi serê xwe be. Sazgeheke neteweyî be û biryarên ku bide divê ji aliyê hemû der û dorên Kurdan ve bê qebûlkirin û çapemenî, weşanxaneyên me riayetî Enstîtuyê bikin.

Ev yek jî dixuye ku hemû kes di alfabeya Kurdî ya Latînî de kêmasî dibînin û dixwazin alfabe biguhere. Divê em ziman rast bikin, hêsan bikin, lê ne ku zirarê bidin rêzimana Kurdî."

Endamê Kargêriya Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê û ji rojnameya Medya Güneşî **Felat Dilgeş** jî, li ser endîşeya kesên ku dibêjin ta niha nivîs bi pirranî bi alfabeya Celadet Bedirxan nehatiye nivisandin lewma divê kes destê xwe nedê, nêrînên xwe bi vî awayî anî ziman: "Tiştê ku em dê bikin, divê hilanîna niqteya li ser **"i"**ya Kurdî ya Latînî be. Xwendin û nivîsandina Kurdî di nav tebeqeyeke teng û elît de maye. Em ji hemû gengeşiyên li ser zimên ku li Ewrûpayê hatiye kirin, agahdar in. Alfabe bi vî awayî ne hêsan e. Divê em rewşa xwendevanên Kurd hildin ber çavên xwe."

Zimanzan **Torî** di vê civîna duduyan de jî mîna ya berê tirs û endîşeya xwe ya guherîna **"i"**ya Kurdî ya bi Tirkî **"ı"** anî ziman û ji aliyê fonetîkê (deng) ve li ser cudatiya wan sekinî û li hember destdana alfabeyê derket.

Zimanzan **Feqe Huseyn Sagniç** ku alîgirê hilanîna niqteya li ser "i"ya Kurdî ye daxuyand ku, di tu alfabeya gelan ên Latînî de ew yeka ku du deng du caran bê nîşankirin nîn e û ji vê rewşê şerm dike.

Feqe Huseyn: "Du deng carek tê nîşankirin, ne du car. Çawa ku **"s"** û **"ş"**, **"c"** û **"ç"** carek hatiye nîşankirin divê **"i"** û **"î"** jî carek bê nîşankirin.Ango divê **"i" "û"**, **"î"**, wek **"i"**, **'û'**, **'ı'** ya Tirkî bin .

**Zana Farqînî** di peyvîna xwe de diyar kir ku îro her çiqas li ser tîpên Kurdî wek **"p"**, **"ç"**, **"t"**, **"r" "k"** û hwd. gengeşî hebin jî, di pratîkê de di warê nivîsê de nebûne gelemşe. Farqînî: "Lê di pratîkê de tîpên **"i"** û **"î"** bûne gelemşe. Di vî warî de sergêjî û geremol heye. Lewma divê em li ser vê rewşê guftûgoyan bikin û biryarên zanistî bidin. Ku em ji aliyê fonetîkê ve li zimanê Kurdî û Tirkî binêrin û bibêjin tîpên me wek **"i"**yê ji Tirkî cihê ne, em ji nav mijarê nikarin derkevin. Mijar, mijara hîndekarî û hêvotinê ye" ramanê xwe diyar kir.

Di dawiya civînê de Serokê Kargêriya Enstîtuya Kurdî **Şefîk Beyaz** jî wiha got: "Divê mirov ji hîmê tiştekî ve dest bi xebatê bike. Hîmê rêziman jî alfabe ye. Em divê bi tirs û xuşûşî li mijarê nenihêrin. Xebata zimên divê bi awayekî neteweyî û sazgehî be. Mijar bi ya min a hînkirin û fonetîkê ye."


Di dawiya civînê de biryara çend civînên li ser gelemşeya alfabeya Kurdî ya Latînî li Ewrûpayê jî hate dayîn.


Civîna pêşîn di 31'ê Tîrmehê de dîsa li bajarê Stenbolê, li Navenda Çanda Mezopotamyayê çêbûbû û ji wê roja ta niha ji hin kes û sazgehan re name, telefon û faxks hatibûn şandin. Ên ku gazî li wan hatine kirin ev in: **A. Tîgrîs, Bergeh, Komkar, Roja Nû, Berhem, Newroz, Newroz Ateşî, Serketin, Hevdem, Baran Rizgar, Selehetîn Gülpinar, S. Rêving, Mahmud Lewendî, Govend, Reşo Zîlan.**

Ên ku bersiv ji wan li ser alfabeyê hatine ev in: **Selîm Biçûk, Malmisanij, Firad Ceweri, A. Balli, Prof. Cemal Nebez.** Ji wan **A. Balli** dixwaze alfabeya Kurdî ya Latinî wek alfabeyên neteweyên Avrûpî, Prof. Nebez jî hilanina niqteyê, yên din jî destnedana alfabeyê di nivîsên xwe de diparêzin.

*Xebata sivîl — 2*

# Mitirb kaniya hunerê ne





*Îro em bi hêsanî dikarin bibêjin ku, gelek berhemên me yên zîhnî, bi saya dengbêjan heta roja me hatiye û ji me re mane.*

**Şerefxan Cizîrî**

Reşîd, Mirad û Mihemed Elî, pirr şer û stranan dibêjin. Ev berhemên devkî bi hêsanî dikarin bibin fîlm û romanên pirr hêja. Heke Yaşar Kemal ji devê Evdalê Zeynikê tiştan digire û dinivisîne, gelo çima edebiyatvanên me yên Kurd berhemên Reşîd, Mihemed Elî û Mirad nanivisînin? Li ser Evdalê Zeynikê bi xwe, çiqas nivîskarê Kurd Mehmet Uzun romanek jî nivîsîbe, divê edebiyatvanên Kurd bi sedan û bi hezaran berhemên wiha biafirînin. Ji ber vê rastiyê min li jor behsa nivîskarê Skottlandî Sir Walter Scott û rejîsorê Japonî Akîro Kurasawa kir. Li vir ez dixwazim, weke ku Tirk dibêjin antî parantêz tiştekî bibêjim: Marks bi kêf û evînî Sir Walter Scott û bi taybetî romonên wî yên li ser civaka kevnare dixwendin.

Ev stran û bûyerên ku mitri bên me dibêjin û dibînin, ji aliyê mijar, hunermendî û edebî ve, ne kêmî xebata Walter Scott û Akîro Kurasawa ne. Ji van epîk û stranan ez dixwazim navê hinekan li vir binivîsinim. Weke mînak "Segvanê Xurrîkî", "Niho", "Evdirehmanê Zorbaşî" ji aliyê honandin û huner ve, ne kêmî "Ivanhoe" an jî "Robîn Hood" in. Di zalimkarî û çavsoriyê de "Sadûn Axayê" Omerî dikare bibe sembol di edebiyata Kurdî de. Sadûn Axa di herêma xwe de bi nav û deng û berdevkê Mîrê Botan bû. Di mijara hezkirinê de "Seyrê Xatûn" û "Cembeliyê Mîrê Hekariyan" dikarin bibin klasîkên Kurdî. Di mêrxasiyê de "Musko", di nakokî ya dînê de "Qûlik" ku behsa şerê nevbêna ezidî û Şikakiyan dike û hwd.

### BEDEWBÛN Û XWEŞIKBÛN

Ji bo ku mirov bikaribe bibe xwediyê dîtinekê li ser mitirban ezê hinek parçeyan ji hunerê wan li vir binivîsînim. Di pirr stran û epîkên Kurdan de behsa

*"Segvanê Xurrîkî", "Niho", "Evdirehmanê Zorbaşî" ji aliyê honandin û huner ve, ne kêmî "Ivanhoe" an jî "Robîn Hood" in. Di zalimkarî û çavsoriyê de "Sadûn Axayê" Omerî dikare bibe sembol di edebiyata Kurdî de. Sadûn Axa di herêma xwe de bi nav û deng û berdevkê Mîrê Botan bû. Di mijara hezkirinê de "Seyrê Xatûn" û "Cembeliyê Mîrê Hekariyan" dikarin bibin klasîkên Kurdî. Di mêrxasiyê de "Musko", di nakokî ya dînê de "Qûlik" ku behsa şerê nevbêna êzidî û Şikakiyan dike û hwd.*

bedewbûna zilaman û xweşikbûna jinan, bi awayekî îdealîzekirî tê kirin. Li gora exlaqê eşîrtî û feodal ev bedewbûna û xweşikbûn ne berbiçav e lê abstark e (soyut). Xweşikbûn û bedewbûna abstrak ji bo hemû kesên "xweşik" û "bedew" derbas dibe. Ev dîtina îdeolojîk ji bo şer wiha ye. Şerê abstrakt her gav dikeve şûna şerê berbiçav (somut). Pratîka eşîrtî berbiçav e, lê îdeolajiya wan jî abstrakt e.

Li bedewbûna zilaman, di pirr epîk û stranan de mirov rastî tarîfeke standart dibe. Wiha tê gotin.

Ev çi xort in bi çi terzî ne
Xortnê baqê bi gulî ne
Bi çef û egalê mizî ne
Bi şal û şapê Botanî ne
Hin devrût in keçkanî ne
Be pêpelûkên Tirkanî ne
Qirik gazekî ji mila kişandî ne
Tu dibêjî, yarebbî Xwedo!
Ez bixwim û vexwim û
Li van xortan bimeyzînim!

Standartkirin û îdealîzekirina xweşikbûnê ji bo janan jî derbas dibe. Îdalîzekirin ji berhem û dîtînên salan pêk tê. Çiqas xisletên bedewbûnê ku di civaka Kurdan de ji bo jinan hebûn û normên xweşikbûna jinan pêk dianîn, li cem xweşikan abstrakt peyda dibûn. Xweşik di civaka eşîrtî û feodal de weke "Zin" bûn, weke "Seyrê" bûn û "Fatima Selîm Axa" bûn. Mitribê me wiha dibêje:

Yeke bi çi awayî bi çi terzî ye
Yeke anî bi deqê û poz çelak e
Yekê xemil dîtine
Paşil tûştirê û kemal keroşk e
Bisk bi têl û peşmal şîn e
Ser bi zêr e û diran sedef e
Kesî mirovê wilo nedîtiye
Zendik zerê koçerî ye
Tu dibejî; weke qeşa di qirika we de daniye
Nava serê wî çil û şeş kezî ye
Tiliyê wê ji mûm û şimayê biriye
Siphan ji Xwedê re
Tu dibejî: newqa xwe ji keroşkê û ji çavê xwe xezalê dizî ye
Xurmîn dikeve tok û benî ye
Şewq û şemala vê xezalê diavêjeçol û çiya
Diavêje ser behrê pişta gamasiya
Tu dibejî; yarebbî Xwedo!
Ez bixwim û vexwim û li vê xibşa xezala bimeyzînim!

Di stran û epîkên cur be cur de ev tarîfa standart her gav heye. Jina bedew bejinzirav e weke tayê rihanê ye, bejna wê weke darê rimê ye, weke kara xezala ye, û hwd.

### BEJINZIRAVÎ Û DIRÊJBÛN

Di van tarîfan de tiştek bala min dikişîne; li Ewrûpa di dema feodal de jinên xweşik weke kesên qelew dihatin pêşkêşkirin. Jina îdeal li cem Ewrûpayiyê feodal, jina dagritî bû. Dagirtîbûn û qelewbûna jinan îşareta bêkariyê (betalî) bû. Pirr wênecêkeran di dema feodal de, di tabloyên xwe de jinên qelew ji xwe re dikirin model. Lê li cem Kurdên eşîr û feodal bejinziravî dirêjbûn, weke normên xweşikbûna jinan dihatin qebûlkirin. Ev rastiya kulturî bala min pirr dikişîne. Gelo li cem Kurdên eşîr û feodal çima bejinziravî û direjbûn model e? Ji bo ku mirov bikaribe bersivekî baş li ser vê yekê bide, divê mirov lêkolînên pirralî bike..

Mitriban ne tenê xweşikbûn îdealîze dikirin, lê di hinek cihan de şer jî dihat îdealîzekirin. Li gora vê îdealîzekirinê û standartkirinê, şerên di navbêna eşîrê Kurdan de, şerekî bênavci ye. Tu hêz, herdu aliyên ku şer dikin, ji hevdu cihê nakin. Kuştin û xwînrijandin bê sînor e. Di pirr şeran de jin û zarok jî tên kuştin. Şer, bi şûr û riman, bi gurz û mertalan, bi dar û keviran û destpekê berdewam dike. Cîhan bi vî şerî dihise û di dawî de şer dibe efsane û bi awayê cur be cur li nav xelkê belav dibe. Mitrib wiha dibêje:

Hineka digot; Eliyê şêrê
Avêtiye ser geliyê Qulbê
Aniyê qira kufara
Hineka digot; dengê bilûra
Memê şivanê
Hineka digot; gemasiyê çelq li behrê danê
Hineka digot; Gakûvînê li çiyayê Torosê quloçê xwe li hev dane
Hineka digot; Milyaketên li ezmana rahiştine şivên pola û ketine pişt ewra
Ri wan dikin dawa barana!

### ŞERÊ NAVBERA EŞÎRAN

Di van xetên jorîn de mirov dikare bi hêsanî fantaziyeke xurt bibîne. Ji aliyekî ve şer bi hemû realîzma xwe ve li ber çavê mirovan têye raxistin û ji aliyê din ve jî bi fantaziyeke xurt şer têye tarîfkirin. Her çiqas ev şer şerê bixwe bixwe be jî, dîsa mirov dikare xisletên şerê giştî weke zalimkarî, çavsorî, sadîzm û xerakirinê bi hemû awayî di van şeran de bibîne. Pirr caran sebebên şerê nav bixwe, tiştên pirr basît û biçûk in. Şerê navbêna eşîrên Kurdan carina jê pirr bêmane ye û carina jî pirr bi mane ye. Ma gelo şer bi giştî hemû ne wiha ne? Bimanebûn û bêmanebûna şer li gora demê têye guhertin. Ma ev rastî ji bo hemû tiştan derbas nabe?

Mitribên me hêja ne. Divê em li wan û berhemên wan xwedî derkevin. Xebata mitribên me parçeyek ji dewlemendiya edebiyata Kurdî ne. Em hêvî dikin ku nivîskarên Kurd xwedî li xebata mitribên welatê me derkevin. Pirr xebatên mitribên welat li miqabil windabûnê ne. Ji bo ev berhem winda nebin, divê mirovên me bilezînin û xebatên mitribên welat kom bikin. Beriya hemû kesan ev kar, karê dezgehên kulturî ne. Enstîtu û komeleyên me divê zû ji bo vê yekê, ji xwe re program çêkin. Ew ên ku di vê xebatê de texsîr bike nekirker e!

# Beşek ji jiyana gerîla

● *Hevalê serleşker kincê leşkerê Tirk li xwe kir û bi du hevalan re çû cem gundî û şivanan. Heval çawa digihên cem wan nasnameyên wan dixwazin, li tevan dinihêrin. Paşê ji wan re dibêjin: "Hûn alîkariyê bi terorîstan re dikin." Gundî jî dibêjin: "Na wele, em nakin." Hevalê serleşker hinekî bi wan re dipeyive û dawiyê dibêje: "Mihekê bidine me. Pereyê wê jî wê muxtarê gund bide we." Qîma xwe tînin. Heval jî mih anîn û hatin.*

**Selahattîn Aşan**

Em rojekê komek heval ji bo ku têkiliyên Herekol û Xerzan bi hev re girê bidin me xwe amade kir. Ên ku biçûna Xerzanê, hevalê serleşker ji wan re got: "Hevalê ku navê wî hate xwendin bila xwe amade bike." Hevalên ku navê wan hate xwendin xwe amade kirin û xatir ji hevalên xwe xwestin û ketin rê. Ez jî bi wan hevalan re bûm.

Em şevekê bi rê de meşiyan û em ji Herekolê gihîştin Çiyayê Beşê. Em zêde westiyabûn. Ez û sê heval derketin serê gir. Me li der dorê xwe nobet digirt. Carekê me nihêrt ku, leşkerê dijmin ketine çiyê û ber bi me ve tên. Ji bo ku em xeberê bidin hevalên razayî, me hevalek şand. Hevalê ku me şandibû, vegeriya hat cem me û got: "Hevalê serleşker dibêje bila tev werin." Em ji serê gir hatin nik heval.

Em çûn cihekî xweş, bi dar û ber. Me dît ku komek heval ên din jî li vir in. Me du heval ji wan û du heval jî, ji koma xwe şande gund. Ji bo ku xwarinê ji me re bînin. Berî ku heval bigihên gund rastî leşkerê dijmin tên û şer dikin.

Em ên mayîn jî, me xwarina xwe rijand û me cihê xwe guhert. Me hinek hevalan winda kir. Me dît ku sê heval hatin gihîştin me. Wan jî hevdu winda kiribû. Hevalek nehatibû.

Hevalên koma me û ya din, me xatir ji hev xwestin. Em ji wan qetiyan, hatin ber Ava Botanê. Em derbasî herêma Şerwanê bûn. Em vê herêmê nas nakin. Gişt cerdevan in. Herêma wê û cografyaya wê gelek xweş bû, tev dar û ber bû. Lê hinek cih jî rût bûn. Di herêmê de li gundekî bi tenê cerdevan nîn bû. Cerdevanê herêmê gelek hevalan şehîd kiribûn. Em nû çûbûn vê herêmê. Me Ava Botanê xelas kir. Em gihîştin dereke xweş. Me êvarê şeş heval şandin gund. Ên din jî dê biçûna nav dehlê.

Em çûn gund. Ez û hevalek me çû li deriyê malekê xist. Derî vekirin. Gotin: "Kerem bikin, werin derbasî hundir bibin." Me gazî hevalên din jî kir. Ew jî hatin, ez û hevalek li derve man. Me li der dorê nobet digirt. Hevalên ku li hundir nan xwarin, du heval şandin şûna me. Em çûn, me jî xwarin xwar.

Gava ku me serê ewil li deriyê malê dabû, pîreka ku me dîtibû, çûbû aliyê malê û bêhiş ketibû.

Paşê hevalê serleşker behsa wê ji me re kir, ku ew rewş hatiye serê wê.

Hinek heval li wê malê man. Em sê–çar heval ji bo ku têrî xwe nan û xwarinê ji nav gund peyde bikin derketin gerê. Me li deriyek xist. Wan jî heta wê gavê heval nas nedikirin. Cara yekemîn em didîtin. Ji ber vê yekê, xwediyê malê pirr tirsiyabû. Dengê wî li pişt derî dihat. Digot ji zarok û pîreka xwe re: "Ka derî... Ka derî vekin heval in, heval. "Piştî ku deriyê malê vebû, xwediyê malê xwe avête stûyê me. Wî em her yekê sê–çar caran maç kirin. Lê dixuya ku zehf tirsiyabû. Gava ji me re xwarin nan dianî, an jî bi me re eleqedar dibû, dest û piyên wî li hev digeriyan. Di hundir de, vir de dihat û wir de diçû. Ger bi ya me bûya dê xwarin û nanê zarokên xwe jî bidaya me. Lê me nexwest, me li gorî xwe û rewşa malê tişt rakirin.

Me xatir ji malê xwest. Em hatin cem hevalên xwe yên din û me ji malên din jî xatir xwestin û em ketin rê. Em hatin gihîştin hevalên ku di nav dehlê de mabûn. Li nav dehla xweş û fireh em du roj man. Ji bo kifşkirina gundekî me sê heval bi rê kirin. Piştî ku nîv saetek meşiyabûn hevalek li nîvê rê dihêlin. Ji bo ku em wî bibînin û em karibin bi hev re xwe bigihînin gund. Me ew heval dît. Em bi hev re meşiyan û gihîştin hevalên pêşiyê. Yekî ji hevalan zêde fêkî xwaribû û pê nerihet bûbû. Ji ber vê yekê riya diviya em rojekê bimeşiyana, em sê roj meşiyan. Me nêzîkî li gundekî kir. Şivanek li wir bû. Sê heval ji bo riya gund gundiyan pirs bikin çûn cem şivan. Heval ji şivan dipirsin ka çi heye, rewşa wan çawa ne. Şivan: "Wele rewşa gund ne xweş e. Gundî di 1991'an de rakirine çekan û bûne cerdevan." Wekî ku şivan gotibû, rast bû; gundiyan çek hilgirtibûn. Bûbûn cerdevan. Em li nêzîkî gund di nav lat û zinaran de, li cihekî xweş rûniştibûn. Me li gund dinihêrt.

Şivan çûbû li gund qala me kiribû ji cerdevanan re. Cerdevan jî bi pêxistin û tefandina elektrîkê îşaret dabûn qereqolê. Ew jî îşareta cerdevan û dijmin bû. Piştî ku me ew tişt dîtin, em ji wir rabûn. Em bi şûn ve hatin serê girekî ku li nîvê çiya bûn. Der dorê me tijî cerdevan bû. Em jî ew du roj bûn ku, bênan û xwarin bûn.

Êvarê hevalê serleşker em civandin û ji me re got: "Gelî hevalan, ev e du roj in ku, em bêxwarin mane. Ji bo vê yekê emê îşev herin gund. Ger li gund cerdevan hebin ku şer bikin jixwe emê jî şer bikin. Ger ne cerdevan bin emê xwarinê ji bo xwe rakin û emê werin."

Me tevan qîma xwe bi vê yekê anî û me amadehî kirin. Emê şeş heval biçûna gund. Me xeberdanên xwe yên dawî gotin. Em her şeş heval ketin rê. Me derdorê mala perê (kenarê) gund girt. Me li deriyê wan xist. Derî vekirin û gotin: "Kerem bikin, werin hundir." Em derbasî hundir bûn. Me ji wan pirs kir: "Hûn cerdevan in an na?" Wan jî gotin: "Na, em ne cerdevan in." Me xwarin ji wan xwest. Ji me re xwarin anîn, me xwar. Em sê heval rabûn çûn mala muxtarê gund. Me li deriyê malê xist. Derî venekirin. Pîreka muxtar zehf tirsiyabû. Em hinekî pê re axivîn. Lê dîsa jî derî venekir. Pîrekê rabû di pencereyê de xwarin û nan da me. Newêribû derî vebike.

Em çûn me li deriyê maleke din a cînarê mala muxtar, da. Pîrejinek derî vekir. Dît ku em in, xwe avêt stûyê me. Gelek kêfxweş dibû. Pîrejinê ji me re got: "Kurê min, ha ev mal sîxûr in. We hay ji xwe hebe." Pîrê xeberdana xwe berdewam kir: "Heval berê ji vî gundî ev H... gundî îxbar kirin. Li ser giliyên wî, kurê min şeş mehan di Girtîgeha Amedê de raza." Li ser van gotinên pîrê em çûn wê malê. Gava ku me li derî xist, zilamê malê hat ber derî û pirsî: "Ew kî ne?" Dema me got: "Em heval in." Ew çû pîreka wî hat pişt derî pirs kir: "Hûn çi dixwazin?" Me got: "Gazî zilamê xwe bike, bila were derî vebike." Wê jî got: "Ew ne zilamê min bû. Ew keça min bû. Eger hûn xwarinê dixwazin ez bidim we." Em hinek fikirîn ji ber pêvajoya efûya partiyê ku ji bo cerdevan û sîxûran derxistibû û hê dom dikir, me dest neda wan. Em ji wan qeriyan. Em hatin me xatir ji gundiyên din xwest. Me xwarinê hilanî û me berî da cem hevalên ku li çiyê mabûn. Henga em gihîştin cihê hevdîtinê, me dît ku du heval bi tenê hatine, yên din ji ber ku zehf birçî bûbûn, nikaribûn bimeşiyana, bihatana. Me ji wan re hinek xwarin şand. Xwarina xwe dixwin, hinek xurt dibin, piştî nîv saetî bi şûn ve hatin cem me. Em li wir du roj man.

Rojekê ez û çar heval em çûbûn serê sikurekê (gir) me nobet digirt. Me dît gundiyek ber bi me ve tê. Me ew girt anî cem hevalan. Hinek ji me wê de şivan, gundî û pez hebûn. Hevalê serleşker gote gundî :"Here, emê kêliyekê din werin cem we. Tu nizanî ku em gerîla ne û nadî nîşan ku berê te em dîtine." Gundî çû. Hevalê serleşker kincê leşkerê Tirk li xwe kir û bi du hevalan çû cem gundî û şivanan. Heval çawa digihên cem wan nasnameyên wan dixwazin, li tevan dinihêrin. Paşê ji wan re dibêjin: "Hûn alîkariyê bi terorîstan re dikin." Gundî jî dibêjin: "Na wele, em nakin." Hevalê serleşker hinekî bi wan re dipeyive û dawiyê dibêje: "Mihekê bidine me. Pereyê wê jî wê muxtarê gund bide we." Qîma xwe tînin. Heval jî mih anîn û hatin. Me êvarê ew şerjê kir. Me têr goşt xwar û em rabûn ketin rê. Me cihê hevdîtinê ji hev re got û şeş heval çûn gundekî. Ev şeş heval diherin mala muxtarê gund. Heval li malê rûniştî ne. Muxtar telefonê cihekî dike. Heval dibêjin: "Muxtar tu çi dikî?" Muxtar dibêje: "Ez xeberê didim qereqolê." Serleşkerê qereqolê dibêje: "Ez nikarim werim. Heta sibeh dibe emê werin." Heval dibêjin: "Muxtar tu dizanî te çi kir? Tiştê ku te kir mirov dibe mirinê."


Heval wî nakujin. Ev gund carek heşt heval (di 1988'an de) dabûn şehîdkirin.

Heval ji gund hatin. Em li cihê hevdîtinê gihîştin hev. Ji me re gotin: "Sibehê hevalê li serê gir bila bi hay bin. Dibe ku leşkerên Tirkan derkevin van çiyayan." Sibehê ber bi nîvro me dît ku, hevalê nobetê diguherîne, got: "Heval va leşkerê dijmin hildikişin sikûrê." Hevalê serleşker gazî min kir: "Rahêje 200 berik bibe ji hevalên serê gir re û bibêje wan bila hay ji xwe hebin. Dijmin li derdora me ye." Ez çûm sikûrê, min berik dan wan û min leşkerê dijmin nîşanî wan da. Wan hay ji leşkeran nebû. Ez daketim cem hevalan, me tevan çekên xwe û her tiştê xwe bi hev xistin. Em bi wî awayî man heta êvarê. Me dît leşkerê dijmin, kom bûn û vegeriyan qereqolê. Em jî wê êvarê meşiyan, hatin dorhêla Bilîsê. Şeva pêşî em neçûn tu gundî. Şeva din em çûn gundekî welatparêz. Me pirsa hevalan kir. Gundiyan gotin ku berî bi du rojan hatine û çûne. Lê nizanin bi ku ve çûne. Em jî, ji gundiyan re hinek axivîn û di pey de me ji çend gundiyên welatparêz got: "Çi henga we saloxa hevalan bihîst, an jî we ew dîtin xebera me bigihînine wan." Piştî bi mehekê me heval dîtin. Em û wan şevekê bi hev re li çiyê man. Sibehê me bi dûrbînê li hawirê xwe nihêrt. Sê şivan xuya kirin. Bû berê êvarê, em çûn ba şivanan; şivan cerdevan bûn. Dudo ji wan hinekî pîr bûn. Ê din xort bû û ji yên din baştir dixuyiya.

Ê xort ji me re got: "Ezê sibehê ji we re çay, ard, şekir û rûn bînim." Me jî ne got: "Neyine." Wê şevê bizinek da me û sibehê jî tiştên ku gotibû tev anî û hat cem me.

Piştî em gihîştin herêmê, mehek bi şûn ve me bi welatparêz û milîsê gel re têkilî danî. Em gihîştin hevalê herêmê. Li herêma Bilîsê me civîna xwe çêkir. Piştî civînê hinek heval vegeriyan Herekolê û yên mayî jî, li der û dorên Bilîsê hatin belavkirin. Ez jî li Herêma Şêrwanê mam.

Piştî demekê ew hevalê winda bûbû dawiyê digihe herêma Herekolê.



*Di riya afirandina jiyan û welatekî azad û serbixwe de yên hemû xetere, rênc, dijwarî û mirinê didine ber çavên xwe canfîdayê gel gerîla ne.*

# 'Mirov divê li ser zemîneke qewîn xebata hunerî bike'

Di vê hefteyê de qaseteke Hozan Xanemîr di nav weşanên NÇM'ê de derket. Bi vê mebestê me pêwistiya hevpeyvînekê dît ku em pê re bikin.


*Çi tişt bandora xwe li te kir ku tu distrêyî?*

– Ji zarokatiya xwe ve, min guhdariya Radyoya Êrîvanê dikir. Ew stran, klam û deng zehf tesîrê li min dikir. Dengbêjî bi xwe bi bavê min û xalanên min re jî hebû.

Dema ku ez vala dimam, min serê xwe hildianî û diçûm derve, li Zozanê Xanemîr digeriyam û ew klam û stranên ku min ji radyoyê û dengbêjên dora xwe dibihîst, ji xwe re digot.

Ew zozan, ango Zozanê Xanemîr bi belekiyên berfê ve ku berfa wî tu car naqede, bi kaniyên sar û bilindahiya çiya û rewşa wê ve bi rastî pirr bandoreke mezin li wî mirovî ku dibîne dike.

Min vî navê xwe ango Xanemîr ji vî zozanî stand û min xwest ku ez heqê wî jî bidim.



**HOZAN XANEMÎR KÎ YE?**

Di sala 1964'an de li gundê Çorsênê yê Tuxê (Tetwanê) hatiye dinê. Di sala 1979'an de li dawetên derdorên Bilîs, Wan û Mûşê dest bi jiyana stranbêjiyê kiriye.
Ji sala 1987'an vir ve, li bajarê Stenbolê dijî û beşdarî şev, şahî û dîlanên Kurdan dibe.
Xebatên xwe li Navenda Çanda Mezopotamyayê didomîne.
Mizgîn/ Gul Sor Bûne, qaseta wî ya yekemîn e ku bi awayekî profesyonelî di nav weşanê NÇM'ê (Navenda Çanda Mezopotamyayê) derdikeve.
Ta niha li herêma xwe gelek qasetên amatorî bi îmkanên xwe ji heval û hogirên xwe re dagirtiye.

### NAVÊ DENGBEJIYÊ GEWENDETÎ YE

*Jiyana te ya bi vî rengî ji gel re çawa dihat, bala wan bi çi awayî dikişand?*

– Hema bibêje li hemû Kurdistanê kesê ku vê hunerê bike gel bi navê "gewendiyê" ew bi nav dikirin. Ew navê gewendetiyê bi rastî pirr tesîra xwe li ser mirov dihişt. Bergehê hunerê teng dikir, best û hevesa mirov dişikand, dilê mirov sar dikir.

Lê piştî ku têkoşîna neteweyî li nav gel belav bû, ev "gewendeti" bi rûmet bû. Dema ku gel bi awayekî rûmetî li hunerê binêre, mirov mecbûr dibe ku xwe bi pêş ve bibe û xwe fireh bike.

*Sebebê ku tu klam û stranê gelêrî distrê û di qaseta xwe de jî gotiye çi ye?*

– Min di serî de jî got, ez bi klam û stranên gelêrî mezin bûme û min ji wan vî hunerî standiye. Lewre ez bi awayekî gelêrî distrêm. A din jî me hem zimanê xwe û hem jî muzîka xwe bi saya serê "gewendeyan" piçek be jî aniye roja îro.

*Niha li Navenda Çanda Mezopotamyayê komê muzîkê û kesên ku bi serê xwe têne jî distrên hene. Her kes tevî koman, bi awayekî din li muzîkê dinêre. Li ser têgînên wek "hemdemî", "nûjenî", "gerdûnî" munaqeşe tenê kirin. Lê hûn hem di şahî û şevan de û hem jî di qaseta xwe de bi pirranî stran û klamên otantîkî û gelêrî dibêjin. Vê yekê tu dikarî ji me re bi rê û zê bikî?*

– Divê mirov bi awayekî firehî li meseleyê binêre. Ango mirov divê kurt na, lê ji bo pêşerojê jî bifikire. Ev jî heye ku mirov tiştekî çêbike te divê bila bi qasî serê derziyê be jî divê zexim be.

Em tev hê di destpêkê de ne, em di serî de dest pê dikin. Ji aliyê din ve li Kurdistanê çandeke nû tê afirandin. Ji bo rojên li pêşiya me divê li ser zemîneke qewîn mirov xebata hunerî bike.

### EM DIKARIN BI GUŞE GUŞA AVÊ JÎ MUZÎKÊ ÇÊBIKIN

*Hûn dibêjin her tişt divê ji serî dest pê bike. Lê li gorî hin kom û kesan ew merhale qediyaye. Dibêjin, "Êdî em bi def û zirneyê nikarin muzîka Kurdî çêbikin."*

– Divê em li ser zemîneke zexim û bi gihandineke çandî ya baş li meseleyê binêrin. Bi ya min em hê di serî de ne. Em dikarin bi guşe guş û bi fikandinê jî muzîkeke gihîştî çêbikin. Enstrumanên me têrî me dikin ku em muzîkeke baş çêbikin. Gelek kes hene ku bi Kurdî distrên lê bi Kurdî nizanin. Ev kêmasiyek e. Di strandinê de ziman jî gelek muhîm e.

*Hûn tevî komên muzîkê yên NÇM'yê derketibûn turneya Ewrûpayê. Demeke dirêj li wê man. Dikarin behsa xebatên çandeyî yên li wê derê ji me re bikin?*

– Li ser çandê hîn hunereke pêşketî li wir çênebûye. Birek fedekariyên mezin hatine kirin. Lê belê fedekarî ji bo pêşvebirina çandeya neteweyî têr nake.

Ev kêmasî, ev e salek e ku di dilê hevalên wê derê de jî hene. Ji bo helkirina kêmasiyan bi dil û can dixebitin.

Mesela gelek stranên gelêrî xera kirine. Muzîka wan hilanîne lê gotinên nû zêde kirine. Ji muzîkên biyanî tesîr standine. Yanê ji bo arşîvê tiştekî zexim nîn e.

Divê HUNERKOM zehf zêde li ser çandê û berhevkirina klam, stran û hêjayên me yên devkî bixebite. Di axaftinên me de fikrên wan gelek baş bûn, lê hewceyê di gotinê de nemîne û li gorî wan fikrên qenc xebat bêne kirin.

*Li gorî te di muzîka Kurdî de divê aletên xerîb neyêne xebitandin?*

– Em nabêjin bila neyê xebitandin. Gazina min ew e ku, mirov texlîtê neke.

Mînakek bidim. Di festîwala Hambûrgê de komeke Îsraîlî, muzîka gelên Rojhilata Navîn pêşkêş kir. Pêşî bi muzîka xwe dest pê kirin, dû re yên Tirkî, Erebî bi awayekî klasîkî gotin. Her kes li wan hejmetkar ma.

Ev vî tîne bîra mirov ku divê her tişt bi zanebûn be. Îro li cem Ewrûpiyan tu heta êvarê li gîtarê bixî tiştek nayê ber çavên wan. Lewre zanin ku yê wan e.

*Lê li cem me Kurdan gîtar wek aletekî nûjen, hemdem û gerdûnî tê nasîn. Em bala xwe didinê, ên Tirkan jî wisan e. Kesên ku navê nûjenî, hemdemî li xwe dikin, bi pirranî amûrên (aletên) Ewrûpî bi kar tînin. Tu çawa li vê rewşê dinêrî?*

– Îro êdî derev li ser avê ketiye. Her çiqas dewleta Tirk bi zilm û zorê tiştê me ji xwe re kiribe mal jî, her tişt eşkere bûye. Em hîn nû bi hişê xwe ve tên. Lewre divê em ji qurmê xwe ve li xwe binêrin û tiştan bidinê milet.

Îroj tu li hemû dinyayê bigerî, tu rastî govend û folklora wek a Kurdî nayêy. Ev govend, ne li ber gîtarê, lê li ber def û zirneyê tê lîstin. Her tişt xusûsetên xwe hene.

Mesela Îspanyolî xwe bi dansa ber gîtarê bi dinyayê dane naskirin. Ew li ber gîtarê paniya xwe li erdê didin. Mesele ew e ku, mirov çanda xwe bicivîne û bi çanda xwe li zengîniya dinyayê binêre. Ên ku bi gîtarê û bi orgê muzîka Kurdî çêdikin bêhtir li mektebên Tirkan xwendine, asîmîle bûne û pirrî guhdariya muzîka xerîb kirine, tesîr li ser wan maye. Lê ji muzîka gelê xwe ne agahdar in.

### DIVÊ EM BI ÇANDA XWE LI ZENGÎNIYA DINYAYÊ BINÊRIN


*Heta niha gelek qaset derketine piyaseyê. Tu dikarî ji me re li ser wan nirxandinekê bikî?*

– Hinek kes îro rabûne muzîka Kurdî çêdikin, distrên. Lê ta îro kesî wan di nav xebat û xizmeta ji bo gel de nedîtiye. Tev menfetperest in. Heta em dikarin navê cehşikên (koricî) çandê jî li wan bikin.

Gelek jê jî, ji qasetan dixuye ku bi Kurmancî nizanin, ziman tevlîhev dikin, ji qasetan helbest distînin û distrên. Ev jî ne hunermendîtî ye.

Ger ku ev kes xweş vî hunerî bidomandana û tiştekî baş çêbikirana, NÇM çima dihate avakirin. Divê ev kes êdî li derveyî vê sazgehê nemînin û karê xwe bi zexmî bikin. Cihê kesê ku dibêje ez ji bo gelê xwe xebata çandê dikim cihê wan Navenda Çanda Mezopotamyayê ye.

***Hevpeyvîn: Zana Farqînî***



*Ozan Xanemîr: 'Hema bibêje li hemû Kurdistanê kesê ku vê hunerê bike, gel bi navê "gewendiyê" ew bi nav dikirin. Ew navê gewendetiyê bi rastî pirr tesîra xwe li ser mirov dihişt.* *(Wenê: Salih Günbat)*

# Em dê bi ser bikevin

***Ew kesê ku berî deh salan û bi taybetî jî zaroktiya xwe di Kurdistanê de derbas kiribe, maneya gotina cendirme û polîs pirr baş dizane. Lewre ew zarokê ku di Kurdistanê de fêma dibû û nediçû, gotina cendirme û polîs dibihîst û bi wan gotinan dihat tirsandin. Ew tirs dikete dilê zarokan, heta mirinê ji dilê wan dernediket.***

S. Özcan

Em dê bi serbikevin. Lewre min doh gilokek herî da destê zarokek Kurd. Wî zarokî ew giloka herî xiste tivingekê, di dewsa bûkekê de. Em dê bi serbikevin.

Ger we rojekê dît, ku min di nav baxên gulê xwe de dest û milên xwe têr û tije hejand û zivirîm, xeman nekêşin. Ne ji dînîtiya min e, hûn bizanin ku wê demê ez azad bûme.

Belê ev gotin ji bo welatê me pirr li cih e û tu gotin û şikek me jî tune ye ji wan gotinan re. Lewre tu şik ji serketina gelên Kurd re tune. Bes ku bawerî û hêviya me li gorî wî be.

Ew kesê ku berî deh salan û bi taybetî jî zaroktiya xwe di Kurdistanê de derbas kiribe, maneya gotina cendirme û polîs pirr baş dizane. Lewre ew zarokê ku di Kurdistanê de fêma dibû û nediçû, gotina cendirme û polîs dibihîst û bi wan gotinan dihat tirsandin. Ew tirs dikete dilê zarokan, heta mirinê ji dilê wan dernediket.

Ew tirs bi cendirme bi tenê jî nedima. Dibûya tirsa hikûmetê û ji hemû memûrên dewletê xof dikirina. Ji ber wê yekê hemû şiklê memûrtiyê di nav gel de li rû bû. Ji tirsa cerdirme û hikûmetê jî kesek nediwêriya gotinek bigotana. Ji ber wê yekê nobedarekî, qolciyekî dikaribû heft gundan bida valakirin. Pirr baş bibîra min tê. Di zaroktiya min de bû. 30 mêran nediwêriya li ber qolciyekî gotinek bigota.

Daxwaziya wan ew bû ku, di mejiyê mirovan de tiştek wiha bidana bi cih dan. "Dewlet mezin e, pirr bi hêz e. Kesek nikare pê re serî derkeve, dikare her tiştî bike."

Jixwe bi zordarî, kedxwarî û qetilxwîniya xwe jî dabûne nîşan. Dixwestin zagona xwe bi tirsê bidine meşandin.

Em dê bi serbikevin: Lewre ew zarokên ku doh bi gotina cendirme û polîs dihatin tirsandin, îro ji bo welatê xwe gerîla ne, ji bo gelê xwe canfîda ne, hêviya serxwebûn û azadiyê ne û di dilê cendirme, polîs û hikûmetê de tirseke mezin in.

Îro polîs û cendirme zarokên xwe bi wan didin tirsandin. Çawa berê digotin, "Megirî cendirme hat, megirî polîs hat" Vê carê îro polîs û cendirme ji zarokên xwe re dibêjin; "Megirî Apocî hatin, megirî terorîst hatin." Ew kesê ku îro di Kurdistanê de dijî wana pirr baş dizane.

Em dê bi serbikevin: Lewre ew zarokên ku heta berî deh salan ji gotina polîs û cendirme ditirsiya, zarokê wî gelê îro di serhildanan de cih distîne, kevir diavêje polîs, cendirme û tîmê taybetî û li ser pişta ker û kûçikan "polîs û tîmên taybetî" dinivîsîne û hwd.

Di Kurdistanê de ev pêşketin gelek mezin in û nayêne qiyaskirin. Ev pêşketin wê gelê Kurd bibe serxwebûnê.

Em dê bi serbikevin.

Gerek e ev êdî were zanîn ku, tu tişt bi tirsê demeke dirêj nayê meşandin. Ku ji rastiyan dûr be jixwe meşa wî pirr çetîn e. Mînakê wî di dîroka civakan de pirr in.

Wek piştî şoreşa Lenîn a Oktobirê, ku gava tirsa sosyalîzmê kete dilê împeryalîstan xwestin ku gelan bi komunîzmê bidine tirsandin. Li Amerîka zarokan bi komunîzmê didan tirsandin. Wan zarokan nedizanîna komunîzm çi ye û çi nîn e jî, lê dîsa jî jê ditirsiyan.

Li Kurdistan û Tirkiyêye jî, ji bo şoreşgerî û serketina şoreşgeran bidin sekinandin derebeg û kompradorên Kurdistan û Tirkiyeyê jî ol, namûs û şeref dixistin hacet û gel bi wî awayî ji komunîzmê didan tirsandin.

Îro jî, ji bo gel ji PKK'ê bidin dûrkirin, dixwazin terorîstî û eşqiyatiyê bikin hacet û gel ji PKK'ê bidin tirsandin. Lê belê êdî dem ne dema korbaweriyê ye. Bi wan riyan nikarin êdî, gelan bidin xapandin û bidin tirsandin. Û jixwe bextê (şansê) wan î xapandin û serketinê jî nemane.


Em dê bi serbikevin.



*Di şerê qirêjî de jî gerîla xwedî hez û evînê ye. Ev hez ne tenê ya ji bo mirovan e.*

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**



**Çeperast:** 1–Nivîskarê Fransiz ê ku di wêneyê de tê dîtin. Sala 1913'yan li Cezayîrê hate dinê. Tevî nexweşiyên xwe yên laşî, her tim bi evîn û hêviyê li jiyanê nihêrtiye û pê ve hatiye girêdan. Gotina wî ya "Ez azadiyê ne ji Marks fêr bûme, ez ji xizaniyê fêrî azadiyê bûm" pirr navdar e. Ji xeynî nivîskariyê, bi rojnamevanî û şanogeriya xwe jî tê naskirin. Di sala 1957'an de xelata Nobel'ê stand. Çend pirtûkên wî ev in: "Biyan, Calîgula, Weba" 2–Katjimêr/ Notayek/ Rojek 3–Kurtiya Şanoya Neteweyî/ Navê jinekê 4–Teşkîlat/ Celebek madeyê şewitandinê 5–Dîn/ Neyînî îfade dike, na/ Jina malê 6–Pêkanîn 7–Pêşiya kirasê mirov/ Cînavka 3. a yekehejmar 8– Daçekek/ Qelp, nesaxlem 9–Navê pêxemberê xiristiyanan/ Baş, rind 10–Pîvan

**Serejêr:** 1–Falbêjî 2–Bi Erebî "Na"/ Eşîret, kom/ Dibêjin dema yek behsa mirov dike ew deng bêhemdî ji mirov dertê 3–Têjika mihê/ Cejn/ Edeb, terbiye 4–Bi Fransizî "Û"/ Fêkiyekî tirş 5–Îqna, ê ku zû ji tiştan fêm dike 6–Firaqeke kincşûştinê/ Cînavkek 7–Cem, bal/ Madeyeke kîmyewî yê ji dilvebirinê 8–Sembola welat û dewletan/ Nebaş, bêsihet 9–Dê 10–Rêxistina ku ji bo welatê Baskê têdikoşe 11–Şemsiye 12–Bizina nêr.

**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Aragon/ Komal 2–Rêveber/ Pale 3–Mn/ Wîlayet 4–Acûr/ Êvar/ Ra 5–Nb/ Ez/ Erafat 6–Cem/ An 7–Îrade 8–Mîrza/ Et 9–Civakî 10–Şe/ Nasa

Serejêr: 1–Armanc/ Meş 2–Rêncberî 3–Av/ Rc 4–Gewre/ Îzin 5–Obî/ Zarava 6–Nelê/ Na/ As 7–Rave/ Deka 8–Yarmetî 9–Opera 10–Mat 11–Al/ Ra 12–Lebat


## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

**Li Tirkiyê:** 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 60.000 | 30 DM |
| 6 meh | 120.000 | 60 DM |
| 12 meh | 240.000 | 120 DM |

# Kana zêran û kana tirran

Hebû nebû, zilamekî hejar û pîreke diya wî. Rojekê diya wî got: “Lawo va ez gihame devê gorê. Ka hê çavê min vekirî, ez te bizewicînim.” Zilam bi ya diya xwe kir û jinek anî. Çendek derbas bû. Jinikê gote mêrik: “Diya te bi xwe de pîs dibe. Ez pê re behdilîm. An wê ew li vir be û an ez!..” Zilam got: “Hermet diya min e, ma ezê wê bibim ku?” Jinikê got: “Na erd bigihê ezmên, divê tu wê bibî.”

Zilam rabû, kurtan li kerê xwe kir. Hinek nîsk, nok û savar kir xurcik û avête ser kerê. Diya xwe li serê siwar kir û berê xwe da çiyê. Çû û çû... Giha newaleke kûr. Li ser devê kaniyekê sekinî. Nêrî ku şkeftek raserî kaniyê ye. Zilam got: “Yadê ji vir û çêtir. Hema li vê şkeftê be. Av jî nêzîk e. Bê ka Xwedê çilo dike.” Zilam diya xwe û ew tiştê ku birin danîn şkeftê û vegeriya malê.

Pîrê nihêrt ku, çil derwêş hatin ser kaniyê. Desmêj girtin. Hatin şkeftê. Mezinê wan got: “Pîrê ma tê mêvana bihewînî?” Pîrê got: “Mêvan ser çavan. Hema tiştê heye emê bi hev re bixwin.” Mezinê derwêşan got: “Pîrê tu halo dil fireh î. Çiqas tu bipeyivî, zêrek ji devê te bikeve.” Wilo çêbû. Çiqas pîrê dipeyivî zêrek ji devê wê dikeve ber. Derwêş rabûn çûn bi riya xwe de. Pîrê jî di nav zêran de maye di şkeftê de.

Zilam sibehekê rabû. Ji xwe re got: “Malava, min diya xwe avête wê şkeftê. Gelo çi dike niha? Ka ez herim, binêrim.” Kete rê û qesta ba diya xwe kir. Çû nêrî ku çi bibîne. Diya wî di nav zêran de winda bûye. Diya xwe avête pişta xwe û anî mal. Jina wî got: “Dîsa te ew paringêla pîra anî, ne wilo?” Zilam got: “Hermet ka bisekine. Xwedê bi elba mezin daye me.” Jinikê nêrî, çiqas xesuya wê dipeyîve zêr ji devê wê têne xwar. Got: “Mêriko ka diya min jî bibe.” Zilam rabû, diya wê jî li kerê siwar kir û bire cihê ku diya xwe lê danîbû.

Bû nêzîkê êvarê. Çil derwêş hatin ser devê kaniyê. Desmêj girtin û çûne hundirê şkeftê. Mêze kirin ku pîrikeke din wa li hundirê şkeftê ye. Mezinê wan got: “Pîrê êvara te bi xêr. Ma tu mêvana nahewînî?” Pîrê got: “Jixwe ûza min hûn in. Çi min têr kiriye? Dor a we ye.. Wî kûçikê zavayê min ez anîm û avêtim vir. Hûn jî tên dibin bela serê min.” Mezinê derwêşan got: “Pîrê tu çi bêhnteng î lê... Hêviya min ew e ku, çiqas tu peyvekê bikî tu pê re tirekî bikî.” Hêviya derwêş cihê xwe girt. Çiqas pîrê peyvekê dike, pê re dibêje: “Pîv” tirrekê dike.



Çend roj di wê navê re bihurîn. Jinikê gote mêrê xwe: “Ka here. Niha komek zêrê diya min çêbûne. Hê kesekî jê nedizîn wan bîne û were. Binêre tu, tu zêran li wir nehêlî ha!..”

Zilam rabû. Kete rê û hate ba pîrê. Nêrî ne zêr û ne tu. Got: “Ka zêrên te?” Pîrê got: “Zêr li ku ne?” Bi peyva xwe re got: “Pîv, pîv...” Du tir kirin. Zilam got: “Ev çi hewalê te ye?” Got: “Ez ji ku zanim?” Dîsa sê tir li dû hev kirin. Zilam hew deng kir. Rahişte destê wê û berê xwe dane malê. Jinik jî pêl wan ve hat. Got: “Yadê tu bi xêr hatî. Ka zêrên te?” Diya wê got: “Zêr li ku ne?” Bi peyva xwe re li dû hev sê tir berdan. Jinikê nêrî ku çiqas diya wê dipeyive tiran dike li mêrê xwe zivirî û bi hêrs got: “Tê vê gavê sê telaqê min bikî destê min û min berdî. Te diya xwe bire Kana zêran û diya min bire kana tira..”


***Berhevkar: Jîr Dilovan***

# Sexda rovî

Roviyek hînî werzê (sebzeyê) yekî gundî bûbû, her roj diçû li navê digeriya gindoran dixwar û xwediyê werzê dixesirand. Mêrikê gundî rabû li ber rovî qoç (faq) veda. Rovî dotira rojê dîsa rabû bi rihetî hate ket nav werz, lê carekê nihêrt ku nikare bilive û ketiye qoçê; kiriye nekiriye xwe ji qoçê; xelas nebûye. Ji xwe re di fikire: “Heke xwediyê werzê min bibîne wê min bikuje.” Serê xwe ber bi esman ve hilda û ji Xwedê re dibêje: “Xwedêyo heke tu min ji vir rizgar bikî, ezê genim bikirim li feqîran belav bikim ji bo fitrê.”

Xwedê li rovî hat rehmê, lingê wî ji qoç filitî. Bi axîn û nalîn xwe gihand binê holikekê û li wir ma heta ku lingê wî sax bû. Piştî lingê wî sax bû, xwe berda nav dehlekê û zikê xwe firikand çû binê dara guvîjekê û berê xwe da Xwedê got: “Ji bo kirîna genim perên min nîn in û ez heywan im, ezê ji ku pera bînim bikirim? Hema perê min hebin jî ezê çawa herim nav mirovan bibêjim ku fitrê genim bidin min? Hema min genim kirî jî ezê bixim nav çi bibim aş? Hema va min bire aş ezê çawa hevîr bikim, ezê li ku agir bikim, ezê ji ku xwê bînim, ezê li ku bikim nan bipêjim? Hema va min peht jî ezê bidim kê de bixwe?” Rovî got: Ya Rebî ez li vê sexdê jovan im (poşman). Di wê navê de zarokan jî keviran diavêtin serê dara guvîjê. Yek ji wan keviran petikî li serê rovî ket û rovî tera bû li erdê ket. Rovî got:“Ê xwedê ne tu dê bibînî, ev çi bêhna te teng e.” Rovî di bîra xwe de got: “Ez dîsa sexdê nedim wê Xwedê bi min vede. Ma heyirî nizane çi bike. Dîna xwe dayê ku du zilam ji dûr ve tên û du ker di ber wan de ne. Barê keran mewîj in. Rovî xwe li ser riya wan dirêj kir, mîna ku miribe. Dema zilam nêzîkî rovî bûn, yê pêşî bang li hevalê xwe kir got: “Bisekine min roviyekî dît, ezê wî bigirim.” Dest avêt sê keviran û hêdî hêdî ber bi rovî ve çû.

Raserî rovî sekinî, pihînekê lê da, nihêrt ku rovî nalebite. Rovî bi ser pişt ve qeliband dîsa his ji rovî nehat. Zilam got “Wîîî wele miriye, lê ezê wî bibim bajêr serê wî jê bikim, postê wî bifiroşim.” Zilam herdu piyên paşî girt avêt ser milê xwe û yên pêşî jî bi paş xwe ve berda û çû. Demekê bi rê de çûn, rovî bi pepikên xwe hêdîka çilûtekî da qûna zilam. Zilam bi hêrs li hevalê xwe fetilî got: “Bira şerm e, tiştê wiha neke.” Hevalê wî got: “Bira qey min çi kiriye?” Zilam got: “Va min jî te re got, careke din wisa neke.”



Qederek çûn, rovî careke din çilûtekê da zilam. Zilam li hevalê xwe vegerî got: “Çima tu wiha dikî? Bela min rovî girtiye çavê te li min nagire. Te divê ha bila ji te re be.” Hevalê wî sond xwar got: “Min dest nedaye te.” Demek xweş bi rê de çûn, vêca rovî heya qeweta wî hebû pencê xwe avêt paşiya zilam. Kezeba zilam êşiya û ji êşa hema rovî avêt erdê û dest avêt tevrê xwe. Hevalî wî dema dît ku tevrê xwe hilda, wî jî dest avêt yê xwe û bi hev ketin. Xwînê di serê herduyan de jî avêt û bi ser hev ve tera bûn erdê. Rovî rabû mewîjan bar kir û çû gundekî bang kir. “Gundîno! Zarokino werin xêra Xwedê mewijan ji xwe re bibin” û kete rê. Serê xwe hilda ji Xwedê re got va min sexda xwe da!”

***Berhevkar: Zekî Beyazît***

# ‘Weke her car PDK’ê kar kir lê gel..?’

**Seyît Çiya**

Li dîwarê salonê Mele Mistefa, di posterê xwe yê mezin de, wek teyran awirên tûj diavêt mêvanan. Awirên wî, bi qasî ku dihate dîtin ne bextiyar bû. Li salonê, ji pazdeh miletan mirov, di nava pazdeh celeb cilan de însan hebûn. Hinek jê dost, lê pirraniya wan jî neyar bûn. Xwediyê malê geh li ba dostan, bes zêdetir li ba neyaran bû. Ev salona ku bi rengên şîn û zer xemilandî bû û lê ala Kurdistanê tune bû, cihê Kongreya Partiya Demokrat a Kurdistana Başûr bû.

PDK, piştî sazumaniya sala 1946'an, Kongreya xwe ya Yekemîn a “azad” û legal li Hewlêr civand. Kongre roja 16'ê Tebaxê dest pê kir, di 24'ê mehê de jî qediya. Kongreya 11'mîn li gor pêvajoyê û li gor encamê, taybetiyên sosret derxiste holê.

Her çiqas tê gotin ku, kongre di şertên “azad” de civiyaye jî, tê fêmkirin, ku ev gotin dûrî rastiyê ye.

Em dixwazin li ser pêvajoya wê û li ser encama wê bisekinin.

### KONGREYA “AZAD” DI BIN XENCERÊN TIRK Û ECEM DE

Di destpêka kongreyê de; artêşa Tirk, di tixûbên Qilaban, Çelê û Navşanê de, li ser ax û esmanên başûre, li hemberî PKK'ê operasyon dimeşand. Di wan rojan de, artêşa Ecem jî, li hemberî PDK–Î, gundên tixûb li nêzî Penjwîn, Helebçe, Ranya û Keladiz bombebaran dikir. Di wan operasyonan de, bi hezaran gundî ji malên xwe koç dikirin, bi dehan mirov jî an birîndar dibûn, an jî dimirin.

Rejîma Bexdayê jî, zor dabû tehdîdên leşkerî û yên aborî. Rejîm, li Behdînan hemû kehre (elektrîk) û riyên Başûr birîbûn, nedihiştin ku tu erebe derbas bibin.

Hikûmeta Hewlêr ku bi giranî di destê PDK'ê de ye, bi pêkutiyên Tirk û Eceman, ji PDK–Î û PKK'ê re zehmetiyan derdixist. Dixwest ku wan ji tixûb derxe û derbasbûna gerîla bibirre. PDK–Î, li ser van pest û pekûtiyan cihên bargehên (meqerên) xwe yên navendî guhertin. Gerîlayên PKK'ê jî, çend caran bi êrişên PDK'ê re rû bi rû bûn.

Bi PKK'ê re şerekî nû li derî bû. Hikûmeta Hewlêr, li peymana piştî Şerê Başûr riayet nedikir. Kovara Dengê Welat ku, li gor vê peymanê ji âliyê PKK'ê ve dihat derxistin, hatibû girtin. Hewlêr'ê, ji PKK'ê, valakirina mal û bargehên bajaran jî dixwest.

Li mehên dawî li bajarê Dihok'ê Mebûsê Asûrî, Serokê Hizba Têkoşîn Rauf Akreî, Berpirsiyarê PKI'yê û Endamê Qomîteya Merkezî ya Zehmetkêş Rênas hatibûn kuştin. Sê meh berê jî, 4 gerîlayên PKK'ê bi destê PDK'ê hatibûne kuştin. Tu mesûlên van cinayetan nehatibûn girtin.

Rewşa aborî ya gel perîşan bû. 500 hezar koçerên Mûsilî û Kerkûkî li çolan, bêwar bûn. Ev koçer ji du salan vir ve di vî halî de bûn. Hikûmet tu alîkarî bi wan re nekiribû.

Tu tevgereke aborî tune bû. Bi sedhezaran ton genim nehatibûne firotan. Bi giştî li erdê mabûn.

Parlamento ji tu karî re nedibû. Hebûna wê sembolî bû.

Hêza hikûmetê nîn bû. Burokrasî jî sembolî bû. Tenê pêşmerge dixebitîn, wan jî kirinên YNK'ê û PDK'ê diparastin.

Rewşa rêzaniyê tarî bû. Ev serokatî pirr caran ji welatên Rojava û ji Tirkiyê laveya alîkariyê dikir, lê bi tenê soz digirtin. Soz jî, zikê birçiyan têr nedikir. Gotin û kirinên van dewletan ne weke hev bûn. Dorpêçkirina (ablûka) aborî ranedikirin û ji bo parastinê dayîna çekan qebûl nedikirin. Ji ber dorpêçkirinê bi deh hezaran zarok û pîremêr miribûn. Hêviya serokatiya Başûr jî heta vê derê bû.

Tu planên YNK û PDK'ê ji bo pêşerojê tune bûn. Bi rejîma Bexdaye re, tu derfetên lihevhatinê nemabûn. Serokatiya Başûr ev îmkan her dem li cihekê vedişart, lê Rojavayê Ferman nedida. Sedam jî, ji lihevhatinê re ne qayil bû.

YNK û PDK'ê li hêzên biçûk pêkutî dikirin. Bi vê pestê yên biçûk tevî nava wan dibûn. Yekgirtin jî di encama van pestan de belav bûbû û di nava PDK û YNK'ê de parve bûbû.

Mam Celal û Kak Mesût jî ne li hev bûn. Di nava hizbên YNK'ê û PDK'ê de hinek pirsgirêk hebûn. Ev pirsgirêk yek caran dibûn sebebên şer. Du roj berî kongreyê di 14'ê mehê de, li Dihokê di nava Nexweşxaneya Azadî de, pêşmergeyên PDK'ê, 3 peşmerge ji YNK'ê kuştin. Yek jî bi birîndarî radest kirin û li ber çavên gel bi gullebaranê kuştin. Ev bûyer hate veşartin.

Reqabet di nava van herdu hizban de dest pê kiribû û ev bi destê dewletên cîran dihate geşkirin. Rejîma Enqerê, bi eşkereyî Berzanî diparast. Mesût, di meha Tîrmehê de hatibû Enqerê, lê serdana Celal ji aliyê meqamên Tirk ve nehatibû qebûlkirin. Enqerê, dixwest ku ev herdu kes berî hev bide.


Bi vê reqabetê re YNK, di rojên kongreya (17 Tebax) PDK'ê de, li bajarê Silêmanî, mitîngeke mezin civand. Telabanî, bi vê mitîngê, ku 100 hezar kes civandibû, dixwest xurtbûna xwe nîşan bide.

***PDK’ê, ji bo kongreya xwe, ji çar aliyê Kurdistanê û dinê re dawetname şandibû. Heta hizbên ku ji çar kesî ava bûbûn jî vexwendibû. Lê bi tenê PKK tune bû. Mixabin, Kak Mesût ji bo hewesa Îstixbarata Tirk di qirikê de bihêle, gazî PKK’ê nekiribû! Guhên mebûsên Tirk jî, ji axaftinên PKK’ê, yên tûj stirîbûn! Ev jest ji aliyê Tirkiyê ve bê “eferîn” nema. Hemû rojnameyên Tirk, mêraniya Kak Mesût nivîsandin!***

### ‘LI DESTEKÊ MÛÇING LI DESTEKÊ NEYNIK’

Rewşa “azad” ev bû! Kongreya PDK'ê, evqas legal bû û di nava vê rewşê de civiyabû.

Kak Mesût, di milê Mam Celal de ket salonê. Li salonê piştî rawestina çepikan, axaftina xwe kir û hat li cihê xwe rûnişt. Cihê wî dinava mevanên Tirk de bû. Li kêlekeke wî mebûsê ANAP'ê, li kêleka dinê mebûsê SHP'ê hebû. Mebûsê DEP'ê ji xwe dûr xistibû. Ên nêzî wî, mevanên Tirk, Ewrûpî û Amerikî bûn.



*Di kongreya PDK'ê de çep û rastên Mesut Berzanî bi mêvanên Tirk û Amerîkî ve hatibû dagirtin.*

Di axaftina xwe de dîsa laveya alîkariyê kir û li ser xawên û mezinatiya demokrasíya Rojhilatê sekinî. Kêfxweşiya tevlîbûna Yekgirtinê jî veneşart. Li gorî wî ev yekbûn, dê ji bo gelê Kurd pirr bi xêr bûya. Di axaftina xwe de her çiqas nav neda jî, rexne li PKK'ê girtin. Li gorî wî demokrasî ji hemû tiştî çêtir bû û têkoşîna çekdarî tu fêde nedianî. Berzanî, qet qala Sedam jî nekir, wî ji bîr kir!

PDK'ê, ji bo kongreya xwe, ji çar aliyê Kurdistanê û dinê re dawetname şandibû. Heta hizbên ku ji çar kesî ava bûbûn jî vexwendibû. Lê bi tenê PKK tune bû. Mixabin, Kak Mesût ji bo hewesa Îstîxbarata Tirk di qirikê de bihêle, gazî PKK'ê nekiribû! Guhên mebûsên Tirk jî, ji axaftinên PKK'ê, yên tûj stirîbûn! Ev jest ji aliyê Tirkiyê ve bê “eferîn” nema. Hemû rojnameyên Tirk; mêraniya Kak Mesût nivîsandin! Ev rojname, bi tenê nenivisandibûn ku, hemû gerîlayên PKK'ê ji ber ku, vexwendiyê Kongreya PDK'ê nebûbûn, gazin dikirin û ji kerban zikêşî bûbûn!

Berzanî, 22'yê Tebaxê, di xeberdana TV' ê de, neyartiya xwe ya li hember PKK'ê ji nû ve teyît kir û got; “Emê li Başûr serbestî ji bo wan nehêlin”. Serokê PDK'ê, dîsa strana şerê birakujiyê dixwend.

Kak Mesut, ji çiyayê Araratê xeyîdîbû!

PDK, wek ku dihate zanîn, bi îdeolojîkî xwe nêzî Rojavayê didît. Li ser girîngiya vê nêzikahiyê sekinî. Bi vê yekê, mesaja Serokkomarê USA (DYA) Bîll Clînton, bi kêfxeşî hate çepikkirin.

Lê di kongreyê de tiştên herî sosret jî hatin dîtîn. Serokê DEP'ê Yaşar Kaya, ku di axaftina xwe de banga yekîtiyê kir û li ser yekîtiya neyarên gelê Kurd sekinî, wî jî Kak Mesût zêdetir çepik girt.

Domahîka Kongreyê ya teknîkî ne girîng bû. Nêzîkî 1500 delege tevî kongreyê bûbûn ku, pirranî ji Ewrûpa û ji Amerîkayê hatibûn. 300 kes ji wan delegeyên Yekgirtinê bûn. Yek ji grîngiyên kongreyê jî, eşkerekirina tevlîbûna Yekgirtinê bû. Hemze Abdullah, ku ji Cîgiriya Kak Mesût betilîbû, cîhe xwe de Serokê Yekgirtinê Samî Abdurahman. Gelek rojnemevan li kongreyê temaşe dikirin, gelek tedbîrên polîsî hebûn, xwarinên xweş dabûn mêvanan, zêdetir jî tiştek nîn bû. Hejmara peşmergeyên PDK'ê hinek din jî zêde dibûn. Li gorî YNK'ê, PDK hinek jî xurt dibû, lê ev xurtbûn wê di xizmeta kê de bûya, ev ne kifş bû.

Mam Celal jî, ku du serê wî de heştê rovî digeriyan û dûvên wan li hev nediketin, dafika ber xwe dîtibû û bi vê zanînê axivîbû. Telabanî, li ser yekîtiya gelê Kurd û li ser lîstikên neyaran sekinîbû. Li gorî wî, neyar dixwestin ku gelê Kurd berî hev bidin! Lê, ji bo Mam Celal sedeqeta bi rastiyê ve, gelek caran bi qasî kişandina çixareyekê kin diajot.

Samî Abdurahman ku di kongreyê de bûbû mirovê duyemin ê PDK'ê, pirr bi kêf bû. Rûyê wî bi ken bû. Êdî ew jî, şirîkê para şêr bû. Vegeriyabû malbata xwe ya kevin. Tenê hay li neynik û mûçinga destê xwe mabû.

Li derveyî salonê jî, jiyan bi gotina Orhan Velî, bi talûkeya “Bombeya Atomî” û “Konferansa Londonê” dom dikir.

Peşmergeyekî pîremêr ji YNK'ê, ji rojnemevanan dipirsî: “PDK'ê dîsa kar kir, lê gel...?”


welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
• Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.